Rupel 1++++++:Layout 1 22.09.2010 17:05 Page 1

# Bêrîvanê dema qetlîamê vegot

**Berîvana 12 salî tekane rêwiya mînîbûsa peyanisê ye ku bi saxî xilas bûye, heta demeke dirêj nikarîbû biaxive. Berîvanê hem dema teqînê vegot û hem jî kul û kesên yên paş qetlîamê hatine hiştin anî ziman. Meryema 2 salî dema dayika xwe dipirse, ew jî dibêjin 'dayika me çûye hecê'**



## Zarokekî rûyê dayika xwe gez dikir

Bêrîvanê, bi kelogirî behsa bûyereke dema teqînê kir û wiha got: "Min dît jineke din jî li erdê ye. Her du lingên wê jêbûbûn. Zarokê biçûk ji bo ku dayika xwe ya mirî rake rûyê wê gez dikir. Lê dayika wê mirîbû."... *R.3*

### BÊRÎVANÊ JI XWIŞKA XWE RE DIBÊJE 'DAYIKA ME ÇÛYE HECÊ'

Her çiqas bi zehmetî be jî Berîvanê cara yekem axivî û wiha got: "Em bi wesayîtê ketibûn riya gund. Dengê teqînê hat. Me got ku wesayît ketiye avê. Ez ji wesayîtê derketim. Dema ez derketim min dayika xwe bi wî halî dît. Lingê dayika min jêbûbû." Bêrîvanê niha li xwişk û birayên xwe dinêre. Bêrîvanê destnîşan kir ku xwişka wê Meryem a du salî niha li dayika xwe dipirse û ew jê re dibêjin 'çûye hecê'... *R.3*

www.welat.com

# Rojeva Welat

23 Îlon 2010 Pêcşem Buha: 50 Kr Hejmar: 16 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Peyanisî gundê xwe diterikînin

300 malbatên peyanisî xwe amade dikin ku mişextî bibin. Rayedarên dewletê pêr çûn Peyanisê û teklîfa rê, av û alîkariya pere li wan kir. Lê wan ev teklîf redkirin. Peyanisiyê bi navê Abdullah Okur got ku wan ji rayedarên dewletê re gotiye heke hûn kiryaran aşkera nekin ew ê mişext bibin. Piştî hevdîtina gundiyan a bi rayedarên dewletê re, gundiyan di nava xwe de civînek pêk anî û biryara mişextîbûnê da... *RÛPEL - 3*

# 'Em ne kevok ne baz in fedaî ne'

Endamê Konseya Leşkerî ya HPG'ê Dr. Bahoz Erdal, bersiv da nûçeyên asparagas ên piştî komkujiya li Colemêrgê, di çapemenî û medyaya tirk de hatin belavkirin. Erdal got: "Di PKK'ê de baz û kevok tune ne, fedaî hene."

### NÛÇEYÊN BÊBINGEH DIWEŞÎNIN

Dr. Bahoz Erdal li ser nûçeyên medyaya tirk ên der barê komkujiya Colemêrgê de ji ANF'ê re axivî û medyaya tirk bi zimanekî tund rexne kir. Erdal destnîşan kir ku malzemeyên li cihê bûyerê hatine dîtin, jixwe hertiştî zelal dikin. Erdal, der barê nûçeyên asparagas ku bûyerê bixin stûyê PKK'ê got ku bi zanebûn têne meşandin û parçeyekî şerê psîkolojîk e.

### EW HÊZEKE FEDAÎ NE

Erdal, ji bo nûçeyên medyaya tirk ên ku îdia dikin ku di nava PKK'ê de baskên cuda hene, vê bersivê dide: "Ev îdiayên medyaya tirk bêbingeh in û beşek ji şerê taybet ê dewleta tirk in... Di nava PKK'ê de baz û kevok tune ne. Serhildêrên ku ji bo doza azadiya gelekî bi awayekî fedaiyane têdikoşin hene.

### ÇIMA DEWLET MUDAXELE NEKIR?

Erdal, der barê xalên tevkujiyê wiha got: "Tevî ku li herêmê Artêşa Tirk xwedî hêz û teknîkeke pir mezin û pêşketî ye, û gava tiştekî piçûk jî diqewime û li ser her îxbarê bi obus û kobrayan herêmê dide ber bombeyan, çima li hemberî komkujiya li Colemêrgê tu mudaxele nekir? Gundê peyanisê nêzî tugaya komandoyan e çima mudaxele nekir.




## Li Geverê ji bo perwerdehiya bi kurdî hezar daxwazname

*Şaxa KURDÎ-DER'ê ya Geverê bi daxwaza "Perwerdehiya zimanê zikmakî" hezar daxwazname radestî Midûriyeta Perwerdehiyê ya Navçeyê kirin. Her wiha boykota dibistanan di roja 3'yemîn de jî berdevam kir. Li Şirnex û navçeyên wê di 3'yemîn roja boykotkirina dibistanan de dibistan dîsa vala man. Bi taybetî jî li Cizîrê ji sedî 95'ê dibistanan vala man û dibistan hatin boykotkirin...* ***RÛPEL - 4***

**BOYKOT:**

## Zarokên xwe neşînin aşê helandinê 'kreş'

Komîteya Ziman û Perwerdehiya Kurdî ya KCK'ê boykota dibistana careke din silav kir û ji bo boykotkirina kreşan bang li gelê kurd kir û wiha got; "Di serî de bang li dayikên kurd û tevahî gelê kurd dikin da ku zarokên xwe neşînin kreşên ku wekî hêlînên pişaftina zarokên kurd hatine amadekirin. Ligel vê çanda pişaftinê zarokên xwe bi çand û zimanê xwe yê neteweyî perwerde û mezin bikin... *R.4*



**BOYKOT:**

## CÎK: Ziwanê makî înkarkerdiş kufr o

Boykota TZPKurdî her ke şino veng dano. Na ray zî Civaka Îslamî ya Kurdistanî CÎK paştî da û waşt ke heme sazî û komelana oldar û kesî ke Homayî ra tesenê û şermayenê kerd û waşt ke, sûreya Rum ayeta 22 di heme çî zelal o. CÎK paştî danê boykota qabê ziwanê makî û daxûyaney de vat: "Xoma (cc) çîyê dawo ma ziwan nîmetê yo. Kesanê ke ney înkar bikê kunê kufrî."... *DIMILKÎ R.9*




**NÛÇE:**

## Di sergoyê leşkeriyê de gorên tomerî

Di encama şerê 30 salan de li gorî daneyên rayedarên dewletê 17 hezar kes ji aliyê kesên nediyar ve hatin kuştin. Bi sedan kes bi awayekî komî di goran de hatin definkirin. Herî zêde jî gorên tomarî yên gerîlayên PKK'ê tên dîtin. Yek ji van gorên tomarî yên gerîlayên PKK'ê jî li navçeya Motkî ya Bedlîsê ye. Şahidên bûyerê behsa bûyerê kirin... *RÛPEL - 3*



## Jinan name ji NY'ê re şand

Endamên Koma Hewldana Konferansa Jinên Kurd, nameya ku daxwazên xwe tê de rêz kiribûn da Nûnertiya NY'yê ya Iraqê. Jinan, xwest ku NY ji bo çareseriya pirsgirêka kurd û erka xwe bicih bîne û ji bo yekitiya neteweyî bikevin nav hewldanan... *R.7*

## Tifaqa neteweyî xurt dibe

Mezinên eşîra Jîrkiyan heyata BDP'ê ya di nav de hevserok Selahattîn Dêmîrtaş û Gultan Kisanak jî heyî, dawetî gundê xwe kirin. Jîrkiyan got êdî dê piştgiriyê bidin BDP'ê û BDP'ê wekî partiya xwe dibînin. Jîrkiyan got ku yekitiya gelê kurd gelekî watedar e û êşên hatin jiyîn bê jibîrkirin û tifaqa xwe xurt bikin... *R.5*



## Di dema AKP'ê de biryarên faşîzane

**Berê li ser dergehên zindanên dewleta tirk ên li Kurdistanê dinivîsî; 'Bi tirkî biaxive pir biaxive!'. Niha konsept guheriye. Dadgehan konsepteke nû daye destpêkirin. Girtiyên parastina bi kurdî dikin pirtir ceza digirin...** *R.4*

www.arsivakurdi.org

# Dîsa hirç bi xwe hisiya

## Piştî boykota referandûmê, ku hêj tansiyona wê ji rojevê neketiye vê carê jî bi boykotkirina dibistanan erd hejiya! Birastî ji erdê pirtir pergala komara tirk hejiya

ADIL QAZÎ

Rojev, heta bêjî germ û tijî ye. 20'ê îlonê dawî li pêvajoyeke hat û dest bi pêvajoyeke nû kir. Hemû çav û guhên derdoran li ser vê rojê bû; 'ka dê çi bibe'! Tevgera gelê kurd, digel hemû hewldanên gurkirina şer û provakasyonan careke din îmkan û derfet da dewlet û derdorên demokrat û aştîxwazan. Hefteyekê rewşa bêçalakîtiyê hate dirêjkirin. Bi ragihandina vê biryarê û şûnda balkêş e, balafirgeha leşkerî ya Amedê di heman demê de kete nava liv û tevgerê. Ev alî bi serê xwe mijarek e, ku bi teqîna provokatîf a li Colemêrgê, her çiqas weke bûyera Şemzînanê kujer li ser sûc hatibe girtin jî, rayedar û çapemeniya amade li gorî fermana ji wan re hatî gotin kasetên xwe dubare kirin…

Em werin ser mijara ziman: weke her sal, ji ber ku mafê herî bingehîn yê însanî tê binpêkirin, di her vebûna dibistanan de daxwaza zimanê zikmakî tê kirin. Îsal jî bi heman şêwazî daxwaza perwerdehiya zimanê zikmakî tê kirin. Yanî em ne mecbûrin ku weke her sal 'heyîna min ji tirkan re bibe diyarî' bibêjin. Weke; 'xwezî bi wî/ê kesî/ê ku bibêje ez tirk im'. 88 sal in ku me, tenê got 'tirk im, rast im, jîr im'. Ji bîr nekin ku her kes bi qasî xwe mêr û mêrxas e. her giya li ser koka xwe şîn dibe. Ji bo xwe naskirinê ji van gotinên nijadperest re ÊDÎ BES E! Divê her gel bi xwe serbilind û bextewar be. Divê jiyana xwe deyndarê gelê xwe be. Ancax ji gelê xwe re bike diyarî. Ji bo ku em vê stûxwariyê, ji xwe dûrketinê rizgar bibin, vê bêrûmetiyê li ser xwe rakin, êdî nejîn dem hatiye ku biryareke cidî were girtin. Ev jî bi boykotkirina hefteyekê dibistanan start hate dayîn. TZPKurdî ligel boykotkirina dibistanan çalakiyên cur bi cur jî destnîşan kiriye. Bi kurtasî di nava vê mehê de, taybetî jî bajar wê bi kurdî bihata xemilandin. Lê mixabin çawa ku demekê ji SÊ RENGÊ (KESK Û SOR Û ZER) kurdî re tehemul nedikirin, lempeyên trafîkê jî guherandin, vê carê jî weke gayên îspanî çav bi paçên sor bixa êrîşî bîlbordên TZPKurdî kirin, anîn xwarê. Hêj bîlbord ji çapê derneketibû hate desteserkirin û der barê wan de doz hate vekirin. Dîsa di serî de Serêkaniyê, Wêranşar, Êlih, Amed û gelek bajar û navçeyên din hêj dest bi xwendina daxuyaniyê nekiri bû êrîş hate ser wan. Gelek aktîvîstên ziman hatin binçavkirin. Li Êlihê, avêtin ser komeleya Kurdî Der ê. Gelek rêber û xebatkarên komeleyê hatin binçavkirin. Esil ev êrîş û zextên li ser sazî û çalakiyên demokratîk derqanûnî ne. Divê li van helwestên wiha êrîşker doz were vekirin. Ku mafê herî demokratîk tê binpêkirin. Balkêş e van êrîş û bê tehemûliyan ne ji aliyê 'dewleta kûr' ve, tev jî bi ferman û hêza dewleta fermî, ya hikûmeta ser kar ve pêk tê. Di serî de serokwezîr, van daxwazên herî mirovane, xwezayî û demokratîk weke çalakiyên îlegal, der qanûnî bi nav kir û fermana çewisandina van daxwazên gel kir. Di piştre, serokomar di gera xwe ya derveyî welat de jî balê kişande ser van çalakiyên ziman û weke 'provakasyon' binav kir. Pêre pêre wezîrê karê hundir, wezîrê pewerdehiyê û rayedarên hikûmetê van daxwazên herî mirovane û demokratîk bi gotinên derqanûnî tawanbar kirin.

Baş e, ew heman serokwezîr nebû ku digotin pişaftin sûcê mirovahiyê ye? Dîsa wezîr û rayedarên hikûmetê qala derqanuniyan dikin! Her sal weke ku tê zanîn dibistan roja ewil navpirsîn-kî hatiye kî nehatiye tune bû. Îsal çi qewimî ku bi vê helwestê gef li zarokan tê xwarin! Weke ku tê zanîn mafê her şagirtekî/e heye ku seran serê salê 20 rojan neçe dibistanê. Yanî şagirt, hetanî 20 rojên wî derbas nebe der barê wî de tu lêpirsîn an jî dozek nayê vekirin. Ango ev çalakiyeke herî demokratîk û di nava zagonên heyî de jî xwedî mafe. Lê wisa xuya ye ku binpêkirina zagonan, an jî carna 'derketina ji zagonan' ji bo hikûmet û rayedarên dewletê re serbest e.

Lê ku gel mafê xweyê herî xwezayî û demokratîk daxwaz bika, an jî ji bo vê bikeve nava hewldanan ew qedexe ye û terorîzm e! Mixabin em bi salan e bi vê zihniyetê re rû bi rû ne! Ji aliyekî din ve jî dewlet di weşanê xwe yên fermî de weke TRT û zanîngehê xwe de bi kurdî heta kare dixebitîne. Lê ku ev ziman ji aliyê xwediyê xwe ve were bikaranîn wê demê qiyamet ra dibe. Baş e, ew ziman ji bo kî ye? Ka te gotibû înkarkirina ziman komkujiya spî ye? Ma qey ev tenê ji bo gelê tirk ên ku li derveyî welat in re derbasdar e? Dema ku serokwezîr diçe derveyî welat tenê tirkan dibîne.

Ji bo zarokên tirkan ku mafê perwerdehiyê nayê dayîn, an jî kêm dibîne, ku yek tirkekî li ku derê cîhanê dibe bila bibe ji mafê xwe yê ziman bêpar e, an jî mafê jiyana zarokekî werê binpêkirin qiyamet radike. Heta diçe Filîstînê an ji bo binpêkirinên mafê zarokan hêsiran jî dibarîne. Baş e, wexta ku tê Tirkiyeyê ye gelo qet tûşî van pirsgirêkan nabe? An jî bi milyonan ku tê îfadekirin, zarokê kurdan rewşa wan nabîne? Na xwe navê vê rewşê çi datîne? Ka te di mitînga Amedê de (hêj du hefte derbas nebûye) te qala Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Apê Mûsa û gelek kesên din kiribû. (di vê navberê de vê jî dixwazim bibîr bînim salvegera qetilkirina Apê Mûsa ye ku hê jî kujerên wê ne diyar e!) Gelo tu der barê van kesan de xwediyê çi agahiyê yî? Qey tu wan navdaran weke kurd nabînî? An jî tenê bilêvkirina navê van kesan bes dibînî? Ger ku tu van kesan nas bikî ev kesana her yek xwediyê nasname û wêjeyeke dîrokî ne. Ji bo ku van pîremêrd ên kurd bê jiyîn divê berî her tiştî zimanê wan were bikaranîn. Nasnameya van feylezofan çi bû, bi awakî serbilindî were gotin, ku her yek di asta feylezofên dema antîk ya yewnanan de ne. Wêjeya klasîk ya cîhanê ji wan haydar e.

Nêzîkahiyeke wiha hebe, ancax wê demê mirov dikare bibêje 'rast e, bi lêvkirina van navdaran ji dile û dixwaze bijîn'! Lê em vê helwesta erkdarên dewletê der barê daxwaza perwerdehiya bi kurdî de ku dibînin pê şaş û metel dimînin.Hêvîdarim gaveke zûtirîn ji vê zihniyet û feraseta yek rengî, yek dengî ya faşîzan vegerin, bi awayeke demokratîk, wek biran ligel hev, her yek bi deng û rengên xwe, bi zimanê xwe bijîn. Daxwaza perwerdehiya bi kurdî nayê wateya redkirina zimanê tirkî (fermî). Tenê; ji bo zimanê tirkî çi tê kirin heman tişt ji bo her zimanê ku di Tirkiyeyê de dijîn re jî tê xwestin. Yanî ligel zimanê fermî, (tirkî) her gel bi zimanê xwe jî bikaribe perwerdehiya bi zimanê xwe, di her qadên jiyanê de pêk bîne. Welatekî demokratîk ancax bi vê hişmendî û ferasetê dikare pêşkeve û azad bibe.




## Deng
## Polîtîkayên hikûmetê xeternak in !

TAYÎP TEMEL tayiptemel@walla.com

Naveroka plana AKP'ê ya ku demeke dirêj e rayedarên hikûmetê di devê xwe de dicûtin her roja diçe aşkeratir dibe. Ev dema krîtîk ji gelek aliyan ve xwedî taybetmendiyên balkêş û ecêb e.

Wisa xuya ye ku armanca esasî ya hikûmetê ew e ku di vê pêvajoyê de muxalefeteke kurd li hemberî Tevgera Azadiya Kurd derxîne holê. Di referandûmê de hemû giranahiya xwe da ser saziyên sivîl ên nêzî xwe. Her wiha hin derdor û kesên ku tu eleqeya wan bi Têkoşîna Azadiya Kurd re tune ne û marjînal in, her tim derxistin pêş û ew wekî nûnerên kurdan pêşkêşî civakê kirin.

Li aliyekî jî her wekî hikûmet dixwaze ku bi kurdan bide bawerkirin ku ew ji bo çareseriya pirsgirêka kurd di nav hewldanên muzakere û hevdîtinan de ye.

Bêguman kurd dxwazin bawer bikin ku hikûmet hewl dide bi Ocalan re hevdîtinê pêk bîne.

Mirov dikare li ser çend xalên ku di vê dema krîtîk de ketine rojevê bisekine;

**A yekemîn;**

Ewil divê bê zanîn ku tu kurd qebûl nakin û pê razî nabin ku di demeke behsa muzakereyan tê kirin de hewldanên ji bo 'Ocalan li derveyî pêvajoyê bê hiştin' derkevin pêş. Rojnameyên nêzî AKP'ê bi awayekî vekirî dibêjin ku dibe di vê pêvajoyê de Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li derveyî pêvajoyê bê hiştin û ev tişt ji wî re bêne gotin; "Heke, daxwazên ku nayên qebûlkirin ji Qendilê re bişînî, em ê te îzole bikin."

Niha li hemberî vê yekê kîjan kurd dikare îkna bibe ku zimanê vê rojnameya nêzî AKP'ê xizmetî çareseriyê dike. Ne mimkûn e ku rojnameya navborî bêyî agahdarî û plana AKP'ê ya kademe kademe vê nûçeyê servîs bike.

**A duyemîn;**

Li Wan, Amed û bajarên din ên Kurdistanê hemû hewldanên rayaderên dewletê ji bo wê yekê ne ku çend kesayet û şexsiyet rabin û li hemberî PKK'ê û BDP'ê çend daxuyaniyan bidin çapemeniyê. Bêguman kurd hişyar in û pûte bi van hewldanan nadin.

Lê serokwezîrekî ku randevûya xwe ya bi Saziyên Sivîl re ji ber ku Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Ahmet Turk di nav de ye betal bike, dê çawa baweriyê bide gelê kurd ku bi rastî dixwaze Pirsgirêka Kurd çareser bike û aştiyê bîne vî welatî? Diyar e formulasyona AKP'ê ya nû ev e; 'Ji DTK'ê re na, ji saziyên sivîl ên aborî re erê' ye.

Xuya ye ku hikûmet bi kontrol dixwaze plana xwe kademe kademe bibe serî. Ji bo ku planeke bi vî rengî biçe serî beriya her tiştî lazim e BDP û hêzên piştgiriyê didin wê bên qelskirin û rêxistina kurdan bê zeyîfkirin.

Niha hemû hêza çapemeniya tirk a nêzî hikûmetê û dûrî wê ew e ku zemîna muxalefeteke kurd li hemberî BDP'ê û PKK'ê çêbike. Vê yekê bi awayê aborî, siyasî û çandî dixwazin pêk bînin.

Divê mirov pê nexape ku rayedarên hikûmetê bi rastî jî ji bo çareseriyê bi saziyên sivîl re rûdine. Siyaseta ku tê meşandin ferz dike ku dem deman AKP bi BDP'ê re jî rûne û peyama; 'ez ev qas demokrat im' bide raya giştî. Polîtîkayên dewletê yên di vê demê de pir nazik û nepenî ne.

Siyaseta kurd di referandûma borî de, careke din ligel hemû hêza dewletê, zextên li ser sazî û dezgehên wê îspat kir ku bêyî Tevgera Azadiya Kurd û Ocalan ne mimkûn e ku çareserî pêk bê, an jî siyaseta kurd bê qelskirin. Di her ceribandina hikûmet û dewletê ya têkbirinê de siyaseta kurd bi awayekî xurtir derdikeve pêşberî raya giştî.

## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**
**1.** Cêr... Beşeke malê, jûr **2.** Bajarekî me... Cejn, eyd **3.** Pirsek di rewşa ne tewandî de... Tiştê ku di pileya duyemîn de ye **4.** Pirtûka pîroz a ji Hz. Îsa re hatiye hinartin... Notayek**5.** Cihê herandinê... Lehengê destana Newrozê **6.** Bi erebî "ez"... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû **7.** Qam... Yezdanekî misrî **8.** Xweliya piştî şewatê... Mehek **9.** Cureyekî zad ku piranî şorbe pê tê çêkirin... Dewara nêrKurteya ajansa nûçeyan a Firatê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**
**1.** Kal û pîra hizhizî... Diravê ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tê wergirtin **2.** Rojek... Kevir **3.** Kurteya piştî zayînê... Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin... Jiyan, heyat**4.** Rewşa derûnî **5.** Baneşana kêfxweşiyê... Rêxistina polîsan a naziyan **6.** Keç... Mêweya ku hîna kal û xang e û nayê xwarin **7.** Beyreq, sembola welatan... Cureyekî xwînê **8.** Pêvek... Kurtebêja Zîvê **9.** Ji vir û şûnde, ji niha pê de... Elementên ne metal,mîna klor, fosfor û oksîjenê

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | L | Î | M | A | ■ | Î | M | H | A |
| 2 | ■ | N | Î | S | A | N | ■ | I | R |
| 3 | T | ■ | K | A | ■ | S | O | L | ■ |
| 4 | Î | S | A | ■ | R | A | ■ | Î | Ş |
| 5 | P | A | P | A | ■ | N | A | ■ | Ê |
| 6 | ■ | Y | ■ | P | Z | ■ | J | Î | N |
| 7 | D | Î | L | ■ | O | T | O | ■ | B |
| 8 | A | ■ | A | E | ■ | Î | ■ | D | E |
| 9 | S | B | ■ | Ç | A | R | D | A | R |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 3 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 4 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 6 | ■ | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 8 | | | | ■ | | | | | |
| 9 | | ■ | | | | | ■ | | |

## Peyanisî gundê xwe berdidin

**COLEMÊRG** – Peyanis tê valakirin. 300 malbat xwe amade dikin ku mişext bibin. Rayedarên dewletê pêr çûn Peyanisê û teklîfa rê, av û alîkariya pere li wan kir. Lê wan ev teklîf redkirin. Peyanisiyê bi navê Abdullah Okur got ku wan ji rayedarên dewletê re gotiye heke hûn kiryaran aşkera nekin em ê mişext bibin. Piştî hevdîtina gundiyan a bi rayedarên dewletê re, gundiyan di nava xwe civînek pêk anî û biryara mişextbûnê da.

Abdullah Okur ev agahî dan: "Heke di nava çend rojan de kiryar neyên aşkera kirin, em ê gund berdin. Duh (pêr) Cîgerê Wekîlê Serokê Koma AKP'ê, Walî, Midûrê Polîsan û leşker hatin. Teklîfa rê, av û pere ji bo me kir. Me teklîfa wan red kir. Me ji wan re got, 'em av, rê û pere naxwezin'. Tişta em dixwazin ew e ku faîl/kiryar bêne aşkerakirin. Heke neyên aşkerakirin em ê gundê xwe berdin. Me gundî di nava xwe de civiyan û me biryara xwe daye. 300 malên ku li gund niştecihin, tevan amadekariyên xwe kirine û em ê terkî welat bibin."



# Dayika me çû hecê

Berîvana 12 salî tekane rêwiya mînîbûsa peyanisê ye ku bi saxî xilas bûyî. Berîvanê hem dema teqînê vegot û hem jî kul û kesên yên paş qetlîamê hatine hiştin anîn ziman. Meryema 2 salî dayika xwe dipirse, ew jî dibêjin 'dayika me çû hecê'



Samî YILMAZ / COLEMÊRG - DÎHA



Berîvan Dayana 12 salî, ji teqîna Peyanisê sax xilas bû. Piştî teqînê şok bû û demekî dirêj nedikarî biaxive. Berîvanê dema teqînê yekemîn car bi me re par ve kir. Berîvan ligel 5 xwişk û birayên xwe bi bavê xwe re têkoşîna jiyanê dê bidomîne. Dayika Berîvanê Semîha Dayan ji ber ku hevserê wê nexweş e debara malbatê ew dike.

Berîvan Dayan di mînîbûsa ku Peyanisê mayin li bin hatiye teqandin de bû. Ligel dayik û pîra xwe li wê mînîbûsê siwar bûbû. Pîra wê mir, ew bi saxî xilas bû. Ji ber şoka teqînê demeke dirêj nedikarî biaxive. Yekemîn car bêdengiya xwe ji bo me xera kir û dema teqînê vegot. Berîvan li kêleka Zeyneba yeksalî ku niha li Meletiyê tê tedawîkirin rûniştî bû. Bêrîvan ji wê mînîbûsa ku bûye xurde bi awayekî mucîzewî bêyî ku birîndar bibe xilas bûye. Piştî teqînê demekî dirêj hişên wê nehatin serî.

Berîvanê kilogirî dema teqînê vegot û got; 'min dît ku dema parçeyên mirovan ji mînîbûsê difiriyan'. Berîvan dema van tiştan dibêje jî şoka dema teqînê ji ser xwe neavêtibû:

**'Rûyê dayika xwe gez dikir'**

Berîvanê wiha got: "Em bi wesayîtê ketibûn riya gund. Dengê teqînê hat. Me got ku wesayît ketiye avê. Ez ji wesayîtê derketim. Dema ez derketim min dayika xwe bi wî halî dît. Dayika min digot, 'alîkariyê bide min'. Lê min nedikarî alîkariya wê bikim. Lingê dayika min jê bûbû. Min got qey ez xewnê dibînim. Min tokat li xwe xistin û kurniçik li xwe xwe dan. Piştre min dît ku jineke din jî li erdê ye. Her du lingên wê jêbûbûn. Zarokê biçûk ji bo ku dayika xwe ya mirî rake rûyê wê gez dikir. Lê dayika wê miribû. Min pîra xwe, ajokar û kurxalê xwe nedîtin. Yên din tev min dîtin."

Berîvan zêdetir nekarî biaxive û giriya. Û nifrîn dikirin. Digot: 'Xwedê bela xwe bide wan ên wisa kiriye.' Berîvanê wiha got: "Kesên bi hawarê rehatibûn ambulans gazîkirin. Heke ambulans di wextê xwe de hatibûna dibe ku hin kesên din jî ji mirinê xilas bûbûna. Di nava wê qelebalixê de min hewl da ku dayika xwe maç bikim, lê destûrê nedan min. Heta dayika min gihandine ambulansê jî dijiya. Dayika min piştre mir. Lê ji min re negotin. Piştî min agahiya mirina dayika xwe girt kezeba min şewitî. Kurxalê min nû ji leşkeriyê hatibû, ew jî di vê teqînê de mir."

**'Wan kezeba me şewitand'**

Dayika Berîvanê ji wê xwestiye ku bibe mamoste. Berîvan got ku ew ê soza xwe ya ji bo dayika xwe bîne cih û wiha got: "Min soz ji dayika xwe re daye ku bibim mamoste. Dayika min dixwest ku ez bibim mamoste. Dayika min êdî tune. Ligel xwişka xwe em ê li xwişk û birayên xwe xwedî derbikevin. Xwişka min Meryem a 2 salî niha jî dayika min dipirse. Em jê re dibêjin 'çûye hecê'.

Xwişka Berîvanê ya mezin Yagmur Dayan 16 salî ye. Yagmur dibêje xwişk û birayên me dê dayika xwe bipirsin û wiha got: "Dibe ku ez li xwişk û birayên xwe binêrim, lê ez ê nikaribin dewsa dayika xwe dagirim. Kezeba me hemûyan dişewite. Xwişk û birayên min tev diçin dibistanê. Mîsoger e ku rojekê dê bêjin 'dayika me li ku ye'. Wê rojê ez ê çi bersiv bidim wan, nizanim. Xwedê belaya xwe bide wan ên ev bela bi serê me de anî."

**'Ez ê çi bikim, nizanim'**

Bavê Berîvanê Ayhan Dayanê ku dayika û hevsera wî hatine qetilkirin jî anî ziman ku 14 sal in bi nexweşiya Behçetê ketiye û nikare bixebite. Ayhan Dayan wiha got: "Em perîşan in. 6 zarokên min hene. Em di kirê de dijîn. Ji niha şûnde jiyaneke zortir li ber me ye. Dayika min ji min stendin. Hevsera min ji min stendin. Her tiştê min ji min stendin. Ez ê çi li van zarokan bikim nizanim. Bi tenê hêviyeke min heye ku kiryarên vê teqînê bêne dîtin. Ji ber ku ez nexweş im bi salan e hevsera min debara malê dikir."

# Îdiaya di sergoya leşkeriyê de gorên tomarî

**BEDLÎS / DÎHA** - Hate zanîn ku di sergoyê Fermandariya Cendermeyan a Motkî ya Bedlîsê de 3 gorên tomarî hene. Şahidên bûyeran diyar kirin ku di pevçûnên cuda de cenazeyên 36 gerîlayên PKK'ê li 3 cihên cuda hatine definkirin.

Di encama şerê 30 salan de li gorî daneyên rayedarên dewletê 17 hezar kes ji aliyê kesên nediyar ve hatin kuştin. Bi sedan kes bi awayekî komî di goran de hatin veşartin. Piştî çend gorên tomarî derketin holê, malbat yek bi yek serî li şaxên ÎHD'ê didin. Herî zêde jî gorên tomarî yên gerîlayên PKK'ê tên dîtin. Yek ji van gorên tomarî yên gerîlayên PKK'ê jî li Motkî ya Bedlîsê ye. Şahidên bûyeran diyar kirin ku disalên 1990'î de Fermandarê Alaya Bedlîsê Korkmaz Tagma ji leşkeran dixwest seriyan jî wî re bîne û gerîlayên PKK'ê yên di pevçûnan de jiyana xwe ji dest didan bi tomarî defin dikirin. Şahidan anîn ziman ku di sergoyê Fermandariya Cendermeyan a Motkî de di sala 1993'yan de 8 kes, di sala 1996'an de 12 kes û di sala 2003'yan de jî 12 kesên bi piraniya wan bêçek kuştin û bi tevahî 36 cenaze li vir definkirin.

**Şahidî bûyer vegot**

Şahidê ku cenaze definkirin û ji ber ewlehiyê nexwest navê xwe bide, diyar kir ku di hewşa qereqolê û sergoyê qereqolê de bi tevahî 36 cenazeyên gerîlayên PKK'ê hatine definkirin. Şahid, anî ziman ku heta niha ezabê wijdan dikişand û biryar da ku çavdêriyên xwe parve bike. Şahid, da zanîn ku wî bi çavê xwe dîtiye ku cenaze di seroya qereqolê de definkirine.

**8 kes di sergoyê de definkirin**

Şahid, da zanîn ku di sala 1993'yan de cenazeyê 8 gerîlayên PKK'ê veşartin û wiha got: "Wê demê em di şaredariyê de dixebitîn. Bang li me kirin û xwestin em bi kepçeyê biçin çalê vekin. Wê demê li 4 gundên Motkiyê pevçûn derketibû. Dema em çûn 2 cenaze ji gundê Karabu, 2 cenaze ji gundê Gazataxe, 4 cenaze jî ji gundê Hamemekê anîn. Me ew definkirin û piştre leşkeran ew der wekî sergo bi kar anî.

Şahid, destnîşan kir ku di sala 1996'an de jî li gundê Senesorê yê Motkiyê dîsa pevçûn derket û di pevçûnê de 12 gerîlayên PKK'ê jiyana we ji dest da. Şahid, da zanîn ku cenazeyê 12 kesan dîsa li sergoyê Fermandariya Cendermeyan a Motkiyê definkirin. Şahid, çavdêriyên xwe wiha anî ziman:



"Li hemberî 12 gerîlayên PKK'ê li gundê Senesorê operasyon hate destpêkirin. Di dibistanê de 12 gerîlayên PKK'ê kuştin. Dîsa bang me kirin û xwestin em çalê bikolin. Piştî me çal kola 12 cenaze bi komî di sergoyê defin kirin.

Şahid, anî ziman herî dawî di sala 2003'yan de di operasyona li gundê Hamemek de 2 jê jin bi tevahî 12 gerîlayê PKK'ê jiyana xwe jidest da. Şahid bi bîr xist ku 8 kesên bi armanca tev li PKK'ê bibin hatibûn gundê Hamenek ketin kemînê û ligel 2 jin 4 gerîlayên PKK'ê hatin kuştin. Şahid, derbirî ku 50 metre dervê sergoyê Fermandariya Cendermeyan hatin definkirin. Şahid, destnîşan kir ku hemû gelê Motkiyê van bûyeran dizanin û parazvanên mafên mirovan dikarin lêkolîn bikin. Şahid, daxuyand ku li gundê Kiznu yê Motkiyê jî di pevçûnekê de 3 gerîlayên PKK'ê jiyana xwe ji dest da û yek jê bi saxî hate înfazkirin. Şahid, anî ziman ku endamê PKK'ê Alîcan Kizilkaya ê ji Motkiyê bi saxî hate girtin û li gundê Muzukê bi saxî hate înfazkirn û pişt re li gel gerîlayên PKK'ê definkirin.

Serokê ÎHD'a Bedlîsê Hasan Ceylan jî anî ziman ku gelek kesan diyar kirine ku di pevçûna gundê Kiznuyê 4 gerîlayên PKK'ê hatin kuştin û li Baxçeyê Fermandariya Cendermeyan definkirin. Karkerekî şaredariyê ku bû şahidê bûyerek din jî diyar kir ku dîsa di pevçûnekê de gerîlayekî PKK'ê yê ji Sûriyeyê jiyana xwe ji dest da û piştî rayedarên leşkeriyê ji definkirinê re bangî wan kir çû cihê bûyerê. Şahid, anî ziman ku ji ber gerîlayê PKK'ê bû ew di sergoyê leşkeriyê de hatiye definkirin.

## Mirina gumanbar a girtiyê PKK'î

**HELEB** - Girtiyek ji doza PKK'ê li girtîgeha Sûriyeyê bi awayekî bi guman jiyana xwe dest da.

Li gorî nûçeya malpera Kurdwatchê ku binpêkirinên mafê mirovan li Sûriyeyê radigehîne, di 28'ê tebaxa 2010'ê de Riyad Ehmed Xelîl (1968) yê ji doza PKK'ê hatî girtin, li Helebê di zindana Dezgeha Ewlekariya Siyasî de jiyana xwe ji dest da. Li gorî nûçeyê, heta niha sedemê mirina Xelîl nehatiye zanîn. Lê gumanên ku Xelîl di encama îşkenceyê de jiyana xwe ji dest daye hene.

Xelîl di 4'ê tîrmeha 2010'ê de ligel kurê xwe Demhat hatibû girtin. Sedema girtina wana jî jiber ku kurê Xelîl tevlî refên gêrîllayên PKK'ê bibû. Kurê Xelîl, Demhat Xelîl piştî mirina bavê wî serbest hat berdan.

# Nîşana îşkenceya li Girtîgeha Tîpa F cilên bi xwîn in

**STENBOL** - 2'yemîn Girtîgeha Tîpa F a Tekîrdagê ya ku her tim bi binpêkirina mafên mirovan di rojevê de ye, nûçeyekê din heye. Girtiyê Nexweşê Epîlepsiyê C. Sînan Halîs Çelîk ê ku bi rîska krîzê re rû bi rû ye û li gel hemû raporên doktoran piştî cezayê hûcereyê ji aliyê gardiyanan ve rastî lêdanê hat û avêtin hucreyê. Xwişka Çelîk, Sevîm Çelîk jî diyar kir ku îşkenceya li birayê wê hate kirin bi îşlîkê xwîn hate belgekirin. Çelîk, anî ziman ku piştî bûyerê serî li hemû saziyên fermî da lê tu encam bi bi dest nexistine û ji bo jiyana birayê xwe bi fikar e. 2'yemîn Girtîgeha Tîpa F a Tekîrdagê ya ku bi binpêkirina mafên û cezayên hûcreyê yên keyfî tê rojevê vê carê jî bi lêdana girtiyê nexweş hate rojevê. Li gorî agahiyên xizmên Çelîk dan bûyer wiha pêk hat: "Ji ber ku Çelîk cezayê hûcreyê xwaribû gardiyan di 13'ê îlonê de çûn koguşa C-78'an. Li ser rapora doktoran a 'Rîska krîzê derbas bike heye û nikare bi tenê di hucreyê de bimîne" habû Çelîk îtîraz kir. Li ser vê yekê gardiyanan êrîşî Çelîk û hevalên wî yên koguşê Erhan Ozel û Resul Çetîn kirin. Gardiyanan bi gotina; 'An em dê cenazeyê we, an jî we bi zîndî ji vir derxînin' gef li wan kirin û li wan xist."

**Fermana ji bo îşkenceyê**

Xwişka Çelîk Sevîm Çelîk piştî çû hevdîtinê hîn bû ku îşkence li girtiyan hatiye kirin. Çelîk, diyar kir ku birayê wê bi kursiyên bi teker anîne hemberî wê û pişt re jî tiştên jiyîn jê re yek bi yek gotine. Çelîk, destnîşan kir ku piştî birayê wê bi kursiya bi teker anîn hemberî wê ji ber birînên li ser û çav û leşê wî nedihate nasîn û wiha pê de çû: "Dema ku min jê re got çî bi te hatiye. Tiştên jiyîn ji min re gotin. 15 gardiyanan êrîşî birayê min û 2 girtiyên din kirine û bi lêdaneke dijwar li wan xistine. Di korîdoran de jî lêdanê dewam kiriye Serê wan li diwaran xistine."

www.arsivakurdi.org

# Qetlîama Peyanisê dilê wan nerm kir

## Mezinên eşîra Jîrkiyan heyata BDP'ê ya di nav de hevserok Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak jî heyî, dawetî gundê xwe kirin. Jîrkiyan got êdî dê piştgiriyê bidin BDP'ê û BDP'ê wekî partiya xwe dibînin



**COLEMÊRG** - Li Colemêrgê rûspiyên eşîra Jîrkiyan ku ev 21 sal in li hemberî PKK'ê şer dike û hetanî niha di vî şerî de nêzî hezar û 500 cerdevanên wê jiyana xwe ji dest dane, hevserokên BDP'ê yên ji bo serdana gundê Peyanisê hatine herêmê gazî gundê xwe kir. Li ser vê yekê hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak çûn gundê Jîrkiyan û ji aliyê mezinê eşîrê Mehmet Adiyaman ve hatin pêşwazîkirin. Adiyaman, di pêşwazîkirinê de xêrhatin da hevserokan û wiha got: "Birêz serokê min, edî partiya me li ku be jîrkî jî dê li wê derê bin. Em dê ji vir û şûn de bi hevre bin."

Mehmet Adiyaman (Mehemedê Reşo) ku li gundê Çemê Ezo yê girêdayî navenda Colemêrgêye û Mehmet Adiyaman (Mehemedê Ehmo) ku li gundê Dêzê rûdinê, heyeta BDP'ê ya ji hevserok, parlamentar û şaredaran pêktê, gazî gundê xwe kiribin. Endamên eşîra Jîrkiyan ku di referandûde jî tevli biryara boykotê ya BDP'ê bûbûn, li gundê Dêzê heyata BDP'ê bi sloganên "Şehîd namirin", "Bijî Serok Apo" pêşvazî kir. Adiyamanan di hevdîtinê de, anî ziman ku wekî eşîrê ji sala 1988'an heta niha bi PKK'ê re şer dikin û wiha pêde çûn: "Ev 21 sal in em li ser sînorê Îranê heta sînorê Sûriyeyê bi PKK'ê re şer dikin. Belkî heta niha PKK'ê hezar û 500 cerdevanên me kuştin. Lê dîsa PKK neqediyaye. Ev 21 sal in, me got piçek maye em PKK'ê biqedînin. Me bi dewletê, çekên giran û cerdevanan lê xist lê dawiya PKK'ê nehatiye. Birêz serokê min înşalah êdî partiya me li ku be dê eşîra Jîrkiyan jî li wê derê be.

Keyayê gund û cerdevan Necman Adiyaman jî bang li Serokê AKP'ê yê Colemêrgê Mehmet Ertuş jî kir û wiha got: "Mayin danîn bin gelê me. Ji refên ku pirsgirêka kurd çareser nakin, îstîfa bike." Hevserokê BDP'ê li qada Dibistana Gundê Dêzê çû cem gundiyan û li vir axaftinek kir û wiha axivî: "Mixabin ev 80 sal in li Colemêrgê êş tên kişandin. Li hemberî van êşan yêkiyan gelê me gelek watedar e. Lazim e êdî em hemû êşên ku hatine kişandin ji bir bikin û tifaqa xwe û yekitiya xwe xurt bikin.

**'Em yek; hêz û vîn in'**

Demîrtaş, diyar kir ku piştî bûyera Colemêrgê yekitî û yekbûn ji hemû kesî re mînak e û wiha got: "Rûspiyên malbatên me ji bo aştiyê tevkariyê didin û em spasiyên wan dikin. Êdî ciwanên me ji bo gelê xwe û civaka xwe têkoşînê didin. Em li hemberî hemû cîhanê dikin qêrîn, em yek; hêz û vîn in. Em dê li ser axa xwe bi ziman, çand û baweriya xwe bi azad bijîn. Em ew biryare daye divê êdî hemû kes vê peyamê baş bixwîne." Keyayê gundê Dêzê yê berê Necman Adiyaman ê ku 2 meh berê ji cerdevaniyê îstîfa kir jî, axaftinek kir û wiha got: "Berî bûyera teqînê li Çemê Ezo pevçûnek çêbû û di nav nîv saetê de bi hezaran leşker anîn van çiyayan. Ez çûm cihê bûyerê min bera xwe dayê. Çima hêzên ewlehî mudaxele nakin. Çima helîkopterek şandin cih bûyer xwestin çanteyên li cihê bûyerê bibin. Ev yek me dixin nav fikaran. Ez bang li Serokê AKP'a Colemêrgê Mehmet Ertuş û hevalên wî dikim. Heke em îro nebin yek em dê kengî bibin yek. Ez bang we dikim ku îstîfa bikin. Serokwezîr di nava nîv saetê de bi daxuyaniyekê dibêje bûyer ji aliyê terorê ve hate kirin û şermezar kir. Hêj dozgeriyê lêkolîn nekir daxuyaniyekî wisa dozgeriyê di bin bandorê de dihêle. Ev tişt nedadî ye. PKK'ê bi daxuyaniyekê got ku me nekiriye. PKK ji tu kesî natirse û heke kiribe jî dê bêje me kir."

Necman Adiyaman, anî ziman ku heke Serokwezîr bixwaze pêşiya çete, JÎTEM, kontrgerîlayên li ve herêmê bigire bi dest ji Ergenekona rojavayê berde berê xwe bide vê herêmê û wiha axivî: "Em êdî wekî cerdevan dernakevin operasyonan. Li vî welatî 25 û 30 milyon kurd dijîn. Ez li vir bang li kesên cerdevaniyê dikin dikim. Em dibêjin dest ji çekan berdin. Niha li vê herêmê 3 hêzên mezin hene. Yek PKK, du TSK û ya sisêyan jî cerdevan in. Em ji cerdevanan ra dibêjin dest ji çeken xwe berdin da ku aştî pêk bê. " Adiyaman, bilêv kir ku ji bo aştiyê divê efuyekî giştî bêdayîn û wiha pê de çû: "Serokwezîr divê ji bo aştiyê destekî dirêjî Îmraliyê bike, yekî ji Qandîlê û yekî jî ji BDP'ê re dirêj bike. Ev nûnerên me ne. Nûnerên gelê kurd in."

# Alîkariya leşkerî ya bi Tirkiyeyê re bibirin

**TEL AVÎV** - Serokê Konseya Rêveber ya KCK'ê Murat Karayilan, di hevpeyvîna bi televîzyona Channel 2 ya Îsraîlê re kirî de, bang li Rêveberiya Îsraîlê kir ku têkiliya xwe ya leşkerî ya bi Tirkiyeyê re qut bike.

Karayilan yekem car hevpeyvînek bi çapemeniya Îsraîlê re pêk anî. Karayilan diyar kir ku pirsgirêkên wan bi Israîlê re hene û sedemê van pisrgirêkan têkiliyên leşkerî yên di navbera Tirkiye û Israîlê de ne. Karayilan li Qendîlê bersiv da pirsên ekîba televîzyona Channel 2 û got: "Sedemê pirsgirêkên me yên bi Israîlê re, têkiliya leşkerî ya di navbera Israîl û Tirkiyeyê de ne. Teknîk û çekên ku Tirkiye li hemberî gel û gêrîllayên me bikar tîne, hemû jî ji Israîlê hatine".

Karayilan qesta Îran û Sûriyeyê kir û diyar kir ku welatê dijminiya Israîlê dikin, dijminiya PKK'ê jî dikin û got; "Em ji Israîlê dixwazin ku alîkariya xwe ya bi yên ku dixwazin têkoşîna me ya azadiyê tasfiye bikin re qut bike". Vê hevpeyvînê di çapemeniya Israîl û ya navnetewwyî de jî cihek girîng girt. Rojnameya herî zêde xwedî prestîj ya Israîlê Haaretzê hevpeyvînê di rûpela xwe ya yekem de weşand. Di nûçeya Haaretz de tê gotin ku piştî serdegirtina Keştiya Mavî Marmarayê, têkiliyên Israîl û Tirkiyeyê hatine asta herî xirab ya dîrokê û di çapemeniyê cih da rayedarên PKK'ê yên ku pir kêm ji çapemeniya Israîlê re diaxivin. Ajansa nûçeya ya Reutersê jî hevpevîna Karayilan ya bi televîzyona Îsraîlê re ji aboneyên xwe re ragihand.

Têkiliyên PKK'ê û Israîlê jiber ku Israîlê di komploya navnetewî ya ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di encama wê de li Kenyayê hate girtin û rasdestê Tirkiyeyê hate kirin de rolek girîng lîst, pir xirab bûn.

# Konsepta nû: KCD'ê nebîne STK'an derxe pêş

**ENQERE** - Li gel ku çareseriya pirsgirêka kurd û riyên muzekereyan tê nîqaşkirin, konsepta hikûmetê ya nû jî diyar bû. Li gorî nûçeya di Rojnameya Yenî Şafakê de hatiye weşandin, konsepta hikûmetê ya çareseriya pirsgirêka kurd ya nû wekî 'KCD'ê nebîne, STK'an derxe pêş e. Di konseptê de "Xweseriya demokratîk" tê redkirin û tevlibûna Ocalan a pêvajoyê jî bi hin şertan re tê girêdan,

Li gel ku têkildarî pirsgirêka kurd, de riyên çareseriyê û muzakere tên nîqaşkirin, hikûmetê jî konsepta xwe ya têkildarî mijarê diyar kir. Konsepta hikûmetê ya nû, di Rojnameya Yenî Şafakê de hate aşkerakirin. Di nûçeya ku bi îmzeya nûnerê rojnameyê yê Enqereyê Abdulkadîr Selvî û bi ser navê "Di pirsgirêka kurd de konsepta nû" hatiye weşandin de detayên konsepta nû derketin holê. Di nûçeyan de, hatina komên aştiyê ya ku ji Xabûrê, weki "Provakasyon" hate binavkirin û tê gotin "Di pêvajoya çareseriyê de dê gelek enstruman di heman demê de bikevin dewreyê". Tê diyarkirin ku di warê muxatabiyê de hikûmet rêxistinên civakî yên li heremê derdixe pêş û wiha tê gotin: "Li Heremê dê rê li ber dengên ji PKK'ê û alîgirên wê re diçin bê girtin". Di nûçeyê de dijberiya kurdan a darbeyê jî wekî "Kurd piştgiriyê didin AKP'ê" hatiye nirxandin û wiha hate gotin: "Kurdan di hilbijartinên 22'yê tîrmeha 2007'an de piştgirî daye AKP'ê." Di çarçoveya konsepta mijara gotinê de tê diyarkirin ku ji Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re bê gotin "An wekî me tu dê tevbigerî an jî em dê te li derveyî pêvajoyê bihêlin". Di nûçeyê de hate destnîşankirin ku rewşa Ocalan dê ji nû ve li ber çavan re bê derbaskirin û ev tişt hatin gotin: "Heke, Ocalan, sînyalên daxwazên ku nayên qebûlkirin ji Qendilê re bişînê. Îzolekirina Îmraliyê dê bê rojevê." Her wiha ji Ocalan re gotineke gelek xetere hate bikaranîn û wiha hate gotin: "Ev tê wê wateyê ku Ocalan girtiyekê ku li benda mirinê ye."

# Hejmara redkarên wijdanî zêde dibe

**STENBOL** - Ji aktivîstên Tevgera Reda Wijdanî Sînan Dolaz daxuyaniyek da û got: "Dibêjin deynê welat û me bi darê zorê dibin leşkeriyê, lê deynê tu kesî li ser min tune ye" û reda xwe ya wijdanî aşkera kir. Li Tirkiyeyê hejmara redkarên wijdanî ligel Dolaz, bû 132.

Ji aktivîstên Tevgera Reda Wijdanê Sînan Dolazê ji Gundê Çoreklî ya girêdayî navçeya Payîzavaya Wanê, daxuyaniyek nivîskî weşand û reda xwe ya wijdanî aşkera kir. Dolazê, ku diyar dike naçe leşkeriyê û wiha got: "Dibêjin deynê welat û me bi darê zorê dibin leşkeriyê, lê deynê tu kesî li ser min tune ye." Dolaz, hincetên reda xwe rêz kir û got ku ew naxwaze bibe parçeyekê qetlîaman. Dolaz, anî ziman ku naxwaze bibe makiyenekî kuştinê û ji ber vê jî reda xwe ya wijdanî aşkera kir. Dolaz, di dawiya daxuyaniya xwe de got ku ez ne dikujim ne jî dimirim û reda xwe aşkera kir. Li Tirkiyeyê hejmara redkarên wijdanî li gel Dolaz, derket 132'yan.



# BDP'ê pirsa binpêkirinên mafan kir

**ENQERE** - Parlamentera BDP'ê Sebahat Tuncel, der barê binpêkirinên mafan ên li girtîgehan û serlêdanên binpêkirinan de pirsname da Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn.

Parlamenter Sebahat Tuncel, da zanîn ku xwişka girtiyê bi navê Halîs Çelîk Sevîm Çelîk diyar kiriye ku îşkence li Cengîz Sînan â Halîs Çelîk ên di Girtîgeha Tîpa F a Tekîrdagê de dimînin hatiye kirin. Tuncel, diyar kir ku Sevîm Çelîk di heman rojê de bi cilên birayê xwe yên hatine çirandin û bi xwîn li Dozgeriya Girtîgeha Tekîrdagê gilî kiriye û piştere jî serî li ÎHD'ê daye. Tuncel, anî ziman ku li gorî agahiyên Cengîz Sînan û Halîs Çelîk ên bi rêya Sevîm ragihandiye; di sibeha 13'ê îlonê de gardiyanên ji bo jimartinê ketine hundir gef li girtiyan xwariye.

Tuncel, da zanîn ku li gel Çelîk bi nexweşiya epîlepsiyê ye û li gel vê yekê jî ji ber "Heza zêde bi kar anîne" lê pirsîn li wan vebûye û Çelîk gotiye ku fermana şîdetê ji aliyê midûrê 2'yem ê girtîgehê Haydar Alî Ak ve hatiye dayîn.

# Ji bo guhdarkirina telefonê e-maîlek bes e

**AGIRÎ** - Derket holê ku ji ber îxbareke bi e-maîlê ku di îdianameya KCK'ê ya Agiriyê de cih digire, Serokê Sendîkaya Genel Îş'ê Ersîn Erînçek û birayê Serokê BDP'a Agiriyê Murat Ozturk ê girtî jî, di nav de telefonên gelek kesan tên guhdarîkirin.

Li Agiriyê ku piştî hilbijartinên heremê yên 29'ê adarê heta niha 100 kes hatine girtin û bi dehan kes jî hatine cezakirin, pêkutiyên kêfî hêj jî didomin.

Li Agiriyê di îdianameya KCK'ê de derket holê ku ji ber e-maîla ku bûye hinceta girtina gelek kesan û hate îdiakirin ku ji navnîşana Serhat Oktay@windowslive hatiye, ev 9 meh in, telefonên Serokê sendîkaya Genel Îş'a Agiriyê Ersîn Erînçek û birayê Serokê BDP'a Agiriyê Murat Ozturk ê girtî Firat Ozturk tên guhdarîkirin.

Erînçek, diyar kir ku piştî 9 mehan hîn bûye ku telefona wî tê guhdarkirin û ev pêkanîn wekî skandeleke hiqûqî nirxand.

Erînçek, destnîşan kir ku e-maîla ku ji hebûna wê jî bi guman e û bi bawer e ku îdiayên der barê planên kuştina Şaredarê AKP'ê yê Agiriyê de jî bi zanebûn tên kirin û wiha got: "Li gorî min ev yek lîstikeke bi pergal e. Îxbarek bi zanebûn hatiye kirin. Teqez di nava vê saloxgerî û guhdarîkirina telefonan de şaredar û derdorên din hene. Lê li vir me dikin hedef û dema tiştekî jî bê serê şaredarê AKP'ê dê bûyerê biavêjin ser me."

Erînçek, anî ziman kompleyek mezin li ser wan dimeşînin û piştî di çarçoveya lêpirsîna der barê wan de hatiye vekirin îfade dane û wan giliyê rayedaran kirine. Erînçek, destnîşan kir ku di giliyên xwe yên kirine de xwestine rastiya vê maîlê bê aşkerakirin.

www.arsivakurd.org

# Ji bo Cemsara Bakur konferansa krîtîk

Heta niha cemsaran bal nedikişand. Ne ciheke jîngehî bûn. Encax di demên dawî de derket holê ku çaryeka rezervên neft û gaza xwezahî li Cemsara Bakur di binê okyanûsê de ye ev jî hesabên li ser herêmê tevli hev kir







**MOSKOW** - Pirsgirêka parvekirina mîneralen dewlemend yên Cemsara Bakur bi konferansek li Moskowê danîn ser maseyê. Ji ber ku li Cemsara Bakur binerdên dewlemend yên wekî neft û gaza xwazahî heye gelek welat doz lê dikin û dibêjin para me jî tê de heye.

Di vê konferansê de bo ku li ser mijarê di nav aliyan de şerê berjewndperestiyê dest pê neke pispor dê li ser mijarê rawestin û li gorî hiqûqa navneteweyî para kîjan welatî li ser Cemsara Bakur heye dê diyar bikin.

Tê texmînkirin ku çaryeka rezervên neft û gaza xwazahî ya cîhanê li Cemsara Bakur e.

Welatên wek Rûsya, Norveç, Kanada, Danîmarka û Amerîka li ser herêmê doza maf dikin.

Cemsara Bakur ji ber guherîna avhewayê û germahiya global qeşaya herêmê bi lez dihele, ev jî lêgerîna ji bo binerdên Cemsara Bakur hêsantir dike.

Herêma ku li Cemsara Bakur dibe mijara nîqaşan rêze çiyayên Lomonosov e û di binê avê dene.

Rûsyayê di sala 2001'an de serî li Neteweyên Yekbûyî da û li ser herêmê doza maf kir. Encax bi têra xwe delîl pêşkêş nekir û NY'ê vê daxwazê red kir.

Ligel vê jî Rûsyayê 3 sal berê ekîbek şand Cemsara Bakur û ala tîtanyum ku tê wateya xwedîlêderketinê li Cemsara Bakur di binê okyanusê de çikiland.

Ancax Wezîrê Enerjiya Xwezahî yê Rûsyayê Yurî Trutnev diyar kir ku ji bo demeke kin planeke wan a xebatê ya li herêma navborî nîn e. Trutnev destnîşan kir ku Lomonosov xebateke ji bo siberojê ye.

Kanada û Danîmarkayê jî li ser herêmê doza maf dikin. Tê payîn ku her du welat di nav demek kin de ji bo herêma ku doza maf lê dikin serî li NY'ê bidin. Encax fikar heye ku demên pêş de van welatên ku doza maf li herêmê dikin di nav hev de pevbiçin û ji bo xwedîtiya herêmê şer biqewime.

# Li Sûriyeyê rêzgirtina ji bo Helepçeyê sûc e!

**QAMİŞLO / ANF** - Rejîma Sûriyeyê ku tu mafan ji kurdan re nanase, "deqeyek rêzgirtina ji bo Helepçeyê" wekî sûc dibîne. Kesên çalakiya deqeyeke bêdeng ji bo kesên di komkujiya Helepçeyê de jiyana xwe ji dest dane, li dar xistin bi hinceta "Gurkirina pêşhûkmên mezhebî" hat sûcdarkirin. Li gorî daxuyaniya malpera Mafê Kurdên Sûriyeyê KurdWatchê, 17'ê çileya 2010'an de dadwerê leşkerî li Qamişloyê ji ber beşdarbûna gel a di deqeyekî bêdeng de şeş meh ceza li Mihemed Şêxo Îsa, Xelîl Îbrahîm Mihemed, Ebdilselam Şêxmûs Mehmûd û Ramî Şêxmûs El Hesen birî. Hat ragihandin ku rêzgirtina ji bo Helepçeyê wekî "gurkirina pêşhûkmên mezhebî" hat tawanbarkirin.

Li gorî nûçeyê, Dadgeha Ewlekariya Dewleta Sûriyeyê ya li Qamişloyê di 15'ê îlona 2010'an de Dr. Luqman Ibrahîm Hisên, Seed Ferhan El Hesen, Ebdilxefûr Hisên Hisên û Selah Seîd Şêxmûs girtin. Berî girtina wan bi rojekê Dadgeha Ewlekariya Dewletê li Amûdê ji wan xwestibû ku serî li dezgeha li Qamişloyê bidin. Sedema girtina wan beşdarbûna çalakiya li dijî Madeya 49'an bû, ku bi înîsiyatîfa Encûmena Siyasî ya Kurdî li Sûriyeyê di 10'ê îlona 2010'an de li Amûdê pêk hatibû. Helwesta Sûriyeyê ya li dijî kurdan her diçe hovtir dibe.

# Li Mahabadê teqîn: Herî kêm 10 kes mirin

**MAHABAD / ANF** - Li bajarê Mahabadê rojhilatê Kurdistanê di dema derbasbûna merasîma leşkerî de teqînek rû da, herî kêm 10 kes mirin û bi dehan kes jî birîndarbûn. PJAK'ê bûyer bi zimanekî tund şermezar kir. PJAK'ê diyar kir ku tu têkiliya wan bi bûyerê re nîn e.

Li gorî kenala televîzyonê ya Erebî Al Alama, bi boneya 30'yemîn salvegara şerê Îran û Iraqê yê sala 1980-1988'an merasîmên leşkerî pêk hatin. Di merasîma leşkerî ya li bajarê Mahabadê pêkhatî de bombeya ku di çanteyekî de hatî bicihkirin di nava qelebalixê de teqiya.

Hat ragihandin di teqînê de 9 kes mirin, piranî zarok û jin bi dehan kes jî birîndar bûne. Şefê polîsan ê eyaletê ku ji ajansa nûçeyan a Mehrê re axivî û diyarkir teqîn di nava grubek jinên ku merasîmê temaşe dikir de teqiyaye. Waliyê eyaleta Azerbaycanê Vahîd Celalzade yê ji ajansa nûçeyan a fermî ÎRNA'yê re axivî îdiakir ku armanca êrîşê pêşîgirtina gel a ji bo beşdarbûna merasîman e.

Her wiha hat zanîn ji bo temaşekirina merasîmê sivîl jî li qadê hebûn. Hîn kes êrîşê negirtiye serxwe.

Lê pêkhatina vê êrîşê ya piştî teqîna di 16'ê îlonê de li Colemêrgê pêk hatî û têde 9 sivîl jiyana xwe jidest da balkişand. Artêşa Îranê ji serê îlonê ve leşkerên xwe ji xetên sînor vekişandibû û êrîşa li hember herêmên gerîlayan jî rawestandi bû.

# 200 hezar kurd 'ereb' tên hesibîn

**MUSIL / ANF** - Serokê Lîsteya Birayetî ya Musilê Xosrew Goran diyar kir ku derdorên şoven yên Musilê, ji ber ku ditirsin ku rastiya şêniya bajêr derbikevin hole, dixwazin jimartina şêniya welêt bê paşdexistin. Li gorî agahiyan kurdên wekî erebe têne hesibandin ji 200 hezarî zêdetir in.

Goran di derbarê mijarê de daxuyaniyekê da û diyar kir ku bi hinceta "pêşmerge û malbetên penaber bi riyên ne qanûnî li Musilê têne bicihkirin" dixwazin jimartina şêniya Iraqê bê paş ve xistin.

Jiber vê jî tenê li bajarokê Başîkê yê Musilê bi qasî 120 hezar kurd in wek "ereb" hatine qeyîdkirin. Her wiha bi heman şêweyî gelek kurdên Êzidî, Gergerî û Şebek di nasnameyê de bi "ereb" hatine nivisandin. Li gorî agahiyan jimara kurdên weke erebe têne hesibandin ji 200 hezarî zêdetir in.

Her wiha, hewldanên jibo paşvexistina jimartina şêniyê, yên ereb û tirkmenên li Kerkûkê jî didomin. Ev demeke dirêje ku ereb û tirkmenên Kerkûkê ji bo paşdexistina jimartinê tiştê ji wan tê dikin. Ji hêlek ve bi êrişên hovanê kurdên li herêmê tên tirsandin da ku ji cih û warê xwe birevin. ji hêleke din ve jî dek û dolabên din tên gerandin.

# Çarîna Rojhilata Navîn bang li Israîlê kir

**QUDS** - Çarîna Rojhilata Navîn ji (Quartet) Israîlê xwest ku dema biryara rawestandina lêkirina avahiyan a li Şerîaya Rojava dirêj bike. Dema biryarê di dawiya vê mehê de diqede.

Nûnerê Koma Quartet Serokwezîrê berê yê Îngilastanê Tony Blair e. Blair xwest ku pirsgirêka dirêjkirina demê bê çareserkirin.

Tê diyarkirin ku pirsgirêk niha li ser taloqkirina demê asê bûye. Blair da zanîn ku heke ev pirsgirêk çareser bibe ji bo hevdîtinan li pêşiya wan salek heye.

Çarîna Rojhilata Navîn (Quartet) pesnê Israîlê ya ji bo dirêjkirina demê ya lêkirina avahiyan da. Hat gotin ku biryar bo destpêka hevdîtinan biryareke girîng e.

Lîderê Filistînê Mehmûd Ebas diyar dike ku ji bo cihûyan li ser erdên filistîniyan heke avahî bên lêkirin dê ji hevdîtinan vekişe.

Israîl jî gef li Filistînê dixwe û dixwaze Filistîn ji bo hevdîtinan şertan daneyne pêşiya wan.

Hevdîtin bi banga Amerîkayê di serê vê meha îlonê de dest pê kire.

Di Çarîna Rojhilata Navnîd (Quartet) de Amerîka, YE, NY û Rûsya heye. Quartatê roja sêşemê li NY'ê civiyan. Di civînê de dîplomatên xwedî tecrûbe cih girtin. Piştî civînê bang daxuyanî dan û bi daxuyaniyê ji aliyan xwestin ku bi helwesteka çêker hevdîtinan bidomînin.

Hefteya bor îlî Şarm El Şêx û li Qudsê alî civiyan. Ancax di van civînan de pirsgirêka rawestandina avahiyan nehat çareserkirin. Ligel vê jî Nûnerê Taybet ê Rojhilata Navîn George Mitchell yê Amerîkayê diyar kir ku di hevdîtinan de pêşketin heye.

Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Israîlê Danny Ayalon diyar kir ku biryara lêkirina avahiyan ya ji bo cihuyan hevdîtinên her du aliyan asteng nake.

Serokwezîrê Israîlê Binyamîn Netanyahu jî diyar kiribû ku ew dê dema biryara lêkirina avahiyan ji bo careke din jî dirêj neke. Encax ew dê lêkirina avahiyan ya ji bo cihuyan dê bi sînor bike. Tenê di bajarê mezin de avahî neyên lêkirin.

# Şewirmendekî Obama îstîfa dike

**WASHINGTON** - Serokê Komîsyona Aboriya Neteweyî ya Amerîkayê Lawrence Summers diyar kir ku di serê salê de îstîfaya xwe dide. Summers şewirmenê aboriyê yê Serokdewletê Amerîkayê Obamayê. Qesra Spî ya Amerîkayê bi daxuyaniyek got ku Summers vedigere ser peywira xwe ya profesoriyê ya zanîngeha Harvardê. Aboriya Amerîkayê ji sala 1930'yan ve resesyona herî bi bandor dijî. Ev dibe 3 kes ku di nava 3 mehan de niyeta xwe ya îstîfayê diyar dikin.

# Li Yewnanistanê karesata koçberan

**ATÎNA** - Daîreya Penaberan a Neteweyên Yekbûyî penaberên ku di nav şert û mercên zor û zehmet de xwe gihandine Yewnanistanê, li Yewnanistanê jî di şert û mercên zor de dijîn û heke tedbîr neyên girtin dê bi karesatên însanî re rû bi rû bimînin. Daîre destnîşan dike ku pergala Yewnanistanê ya ji bo penaberan baş naxebite û kesên ku pêwîstiya wan bi alîkariya navneteweyî heye jî nikarin ji vê pergalê sudê werbigirin. Daîreyê rewşa pergalê pir neyînî diyar kir û got:

"Şert û mercên ku penaber dijîn jî pir zor in, her wiha tu alîkariyê jî nabînin.

Neteweyên Yekbûyî (NY) banga YE'yê kir û ji YE'yê xwest berpirsiyariya xwe ya navneteweyî pêk bîne û alîkariyê bide penaberên li Yewnanistanê.

# El Qaîdeyê 5 fransî revandin

**LAGOS** - El Qaîdeyê li Nîjerê 5 fransî revand û daxuyanî da malpera înternetê ya tevaya El Cezîreyê. Rêxistinê got ku Milê Maxrîbê ya El Qaîdeyê çend roj berê li Nîjerê 5 fransî revandiye. Di peyamê de tê diyarkirin ku dê rêxistin daxwazên xwe hê paşê dê pêşkêş bike. Ev demek e Fransayê hewldide ku cihê 5 kesên ku winda bûne testpît bike. Niha jî dixwaze rastiya agahiyê pesend bike. Di 16'ê îlonê li Nîjerê 7 kesên ku di şirketên Fransayê de dixebitîn ji navenda kana uranyumê ya Arlîtê hatibû revandin. 5 ji wan fransî bûn.

www.arsivakurdi.org

# Jinan ji NY'ê re name şand

**HEWLÊR / DÎHA -** Endamên Hewldana Konferansa Jinên Kurd, li Herêma Kurdistana Federal, ji Neteweyên Yekbûyî re name şand û diyar kirin ku daxwaza jinên kurd a bibin xwedî mafên xwe yên neteweyî, li pêşiya neteweyên din nabe asteng û gotin "Jinên kurd diwazin wekî jinên netewe û civakên din xwedî mafê çand, azadî, demokrasî, edalet û wekhe- viyê bin"

Endamên Koma Hewldana Konferansa Jinên Kurd, li Herêma Kurdistana Federal, di 21'ê îlonê de bi munasebeta Roja Aştiya Cîhanê ya Neteweyên Yekbûyî ji Neteweyên Yekbûyî (NY) re nameyek şand. Jinan nameya ku daxwazên xwe têde rêz kiribûn da Nûnertiya NY'yê ya Iraqê. Jinan, di nameyê xwe xwest NY ji bo çareseriya pirsgirêka kurd û her wiha nasandina mafên jinên kurd a dinava welatên cîhanê de mîsyon û erka xwe bicih bîne.

Jinan, di berdewama nameyê de anîn ziman ku jinên kurd jî wekî hemû jinên neteweyên din dixwazin xwedî azadî, demokrasî, edalet û wekheviyê bin û ji mafê çandî, aborî, civakî û siyasî sûdê bigrin. Jinan, destnîşan kir ku gelê kurd û jinên kurd her tim ji bo aştî û demokrasiyê têdikoşin û ji bo ev daxwazên wan bi cih bê divê welatên ku kurd lê dijîn jî li gorî peymanên navneteweyî yên mafên mirovan tev bigerin. Jinan di nameyê de wiha nivîsandin: "Gelê kurd tu carî nebûye alîgirê şer û her tim li dijî zilm û zortariyê têkoşiya ye. Her wiha dê her tim ji bo aştî, demokrasî û azadiya mirovan jî têkoşîna xwe bidomîne. Di vê çarçoweyê de jinên kurd jî dixwazin wekî hemû jinên cîhanê xwedî maf û hiqûq bin. Ji ber ku gelê kurd her tim rastî înkar û îmhayê hatiye û vîna wî nehatiye qebûl kirin neçar maye ku serî li riya şerê çekdarî bide. Ji bo vê yekê jî divê riyên diyalog û muzakereyê dest pê bike. Ji bo vê yekê jî divê NY rol û erka xwe ya ji bo çareseriyê pêk bîne."

Jinên ku îmze avêtin bin nameyê: Leyla Zana, Nermîn Osman, Ala Talabanî, Sîrîn Amede, Prof. Kajal Rahmanî, Fatma Kurtulan, Amîne Zikrî, Feleknas Uca, Çaglar Demîrel, Nasiq Tovfik, Sabriye Bahmany, Sayran Abdullah, Yuksel Avşar, Ayşegul Dogan, Reyhan Yalçindag, Necîbe Omer, Zozan Ekmen, Mulkiye Birtane, Gul Kiziltaş, Hanife Hebu.



Endamên Koma Hewldana Konferansa Jinên Kurd, nameya ku daxwazên xwe têde rêz kiribûn dan Nûnertiya NY'yê ya Iraqê

## Jin çûn serdana serokê Parlamentoyê

Endamên Hewldana Konferansa Jinên Kurd, çûn serdana Serokê Parlamentoya Kurdistana Federal Kemal Kerkûkî. Endamên Hewldana Konferansa Jinên Kurd, ku li Herema Federal a Kurdistanê di çarçoveya 2'yemîn Konferansa Jinên Kurd, de xebatên xwe ev 4 roj in didomînin, çûn serdana Serokê Parlamentoya Herema Federal a Kurdistanê Kemal Kerkûkî. Jinên ku li ber deriyê parlamentoyê ji aliyê Kerkûkî ve hatine pêşwazîkirin, bi Kerkûkî re civineke ji çapemeniyê re girtî li dar xistin. Hate diyarkirin ku jinan di civînê de dê ji Hikûmeta Kurdistanê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd zêdetir berpisyarî û hewldan xwestin.

Endamên Hewldana Konferansa Jinên Kurd, duh jî bi nûnerên partiyên siyasî yên li Sûriye û Kurdistana Federal re hatibûn cem hev.

# Jinên bûne qurbana zewaca bêqeyd

**STENBOL / DÎHA -** Mêrên ku ji bo kar diçin Ewropayê û bi armanca li wir bimînin, zewacên formalîte dikin û piştre li pey xwe jiyaneke bi êş dihêlin. Li ser vê mijarê projeya bi navê 'Bandora stratejiya pêkanînên koçberên bêqeyd ên ji Tirkiyeyê koçberî Ewropayê dikin a li ser malbatan" hate amadekirin. Li gorî vê projeyê tê gotin ku ev jek rastiya têkiliya civakê û jinan datîne holê.

Bi taybetî piştî salên 1960'î çirok û serpêhatiyên zilamên ku ji bo kar diçin Ewropayê û jinên bî li pey xwe dihêlin, li Ewropayê jî li derveyî fermiyetê gelek zewacan dikin.

Koma ku ji Doç. Dr. Sibêl Kalayacioglu, hîndekarên Zanîngehên Teknîk û Ortadogu, her wiha xebatkara Weqfa Hunera Başakê Humeyra Tosun pêk tên, li nehiya Cîhanbeylî, Golyazi, Kuşçayi û navçeya Kuleyê ya Tavşançali yên Konyayê, bi jinên hevserên wan çûne Ewropa re hevdîtin çêkirin. Di çarçoveya projeya bi navê, "Bandora stratejiya pêkanînên koçberên bêqeyd ên ji Tirkiyeyê koçberî Ewropayê dibin a li ser malbatan" bi 30 jinan re hevdîtin çêkirin.



Humeyra Tosun

### Jin tên xapandin

Serpêhatiya hemû jinên ku hevserên wan çûne Ewropayê qeder û êşên wan dişibin hev. Bi koçberiya hundir a di salên 1980'yan de dest pêkir de, zilam bi armanca kar bi dest bixin diçin Ewropayê jinên li pey wan dimînin jî bi salan ji mezinkirina zarokan, karên zeviyan û hemû karên din ên dikevin ser milên wan dikin, zilam jî li Ewropayê ji bo xwe jiyanek nû ava dikin û dizewicin. Di hemû hevdîtinên hatin kirin de serpêhatî û êşên hemû jinan wekî hev derketin. Hemû jinan diyar kir ku hevserê wan soza "Ez dê te jî bibim Ewropayê" didin wan, lê li gel sal di ser de derbas dibin dîsa zilamê wan, wan nabin cem xwe û wan bi qedera wan re dihêlin. Endama Waqfê Humeyra Tosun. diyar kir ku di sala 2009'an de bi armanca balkişandina ser jiyana li pey koçberiya ber bi Ewropayê ve dimîne ye û wiha got: "Em li ser jiyana jinên li pey vê koçberiyê dimînin sekinîn. Bi taybetî li herêmên Anatolyaya Navîn li cihê kurd lê dijîn ev pirsgirêk zêde ye."

### Jin parazvaniyê dike

Tosun, destnîşan kir ku sedan jinên ji ber di warê aborî de mîsogeriya wan nîn e, bi hêviya dê rojekê biçin Ewropayê di nava bendewariyekê de ne û wiha axivî: "Di hevdîtinan de jin bi piranî naxwazin nasnameyên xwe bidin. Jin bi tirsên gelo em biaxivin di warê çûna Ewropayê de dê pirsgirêkan bijîn? An jî dê jiyana hevserê wan li Ewropayê bê astengkirin? tev digerin. Di hevdîtinên me de derket holê ku jin jî mafên xwe yên bingehîn jî mafên hiqûqî bêpar in. Ji ber ku zilam ji bo biçin li Ewropayê bicîh bibin lazim e zewacên formalîte bikin. Lewre jî dema vê yekê dikin, divê hevserên xwe yên li Tirkiyeyê berdin. An jî zewaca olî hebe hewceyê zewaca fermî nabînin. Ji ber vê yekê jî jin di warê zewaca xwe de û jiyana xwe ya hevpar de tu daxwazên xwe yên hiqûqî nikare bine ziman. Aliyê din ê girîng jî ew e ku jin di dîtbariyê de zewicî ye, yanî têkîliya zewacê didome. Lê di fermetiyetê tiştekî wiha nîne. Mînak, piraniya zilaman diçin heta 7 salan qet nayên. An jî piştî çend salan tên. Ji ber vê yekê jî jin tenê wekî parasvanan zarokan û eger di nava malbata mezin de bixebite jî wekî kesê kar bi rê ve dibe dimîne."

Tosun, destnîşan kir ku piştî demekê jin dibin wekî koleyên zilam û tenê ji bo xizmetê, mezinkirina zarokan tên dîtin. Tosun, da zanîn ku dema pirsa 'we li hemberî vê rewşê tiştek kir?" dipirsin jî rastî bersiva "Hemû jin vê yekê dijîn" tên. Tosun, derbirî ku zilamên diçin Ewropayê di rewa ku divê kesekî bi xwe re bibin jî yekem daxwaza wan birayên wan in û dîsa jin di plana duyem de dimînin. Tosun, destnîşan kir ku drama herî mezin jî, hevserên wan ên ji bo biçin Ewropayê zewacên formalîte dikin û piştre re ji formalîteyê dertên e.

### 'Jiyana me ya metresan e'

Tosun, balkişan ser travmaya kûr û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Zilamên diçin Ewropayê, piştî demek din dema vedigerin welat bi xwe re hevserên xwe yên ji Ewropayê jî tînin. Ev yek ji bo jinan dibê êşek nayê gotin. Ev yek jî rê li ber travmayên mezin vedikin. Ya rast jinên tên dibin hewî. Jinên ku me bi wan re hevdîtin pêk anîn jî diyar kirin ku jiyana wan wekî jiyana 'metresê ye'. Ev yek rast e, eger ev yek bi cureyek din bûna dê rastî bertekên mezin bihatana. Ev yek mînakek ji ehleqên civakê yên durû ne." Tosun, diyar kir ku dixwazin vê projeyê bidomînin û di asta wê ya duyem de jî dixwazin jinan di warê hiqûqî de agahdar bikin.

## Rêxistinên jinan li Serayê hatin cem hev

**WAN -** Rêxistinên jinan ên li heremê xebatên xwe dimeşînin, ji bo pirsgirêkên jinan çareser bikin û piştgiriya hev bikin li Wanê hatin cem hev. Rêxistinên jinan ên li heremê hatine avakirin û ji bo pirsgirêkên jinan ên civakî, aborî û tenduristiyê çareser bikin xebatan dimeşînin, li Wanê li hev civiyan. Komelaya Jinan a Serayê, Komelaya Jinan a Mûşê, Komelaye Jinan a Sîtiya Zîn û Komeleya Jinan a Erdîşê bi boneya nasîna hevdu û xebatên hevpar bimeşînin, li Mala Mamosteyan a Seraya Wanê li hev civiyan.



Hêvî Berwarî



hberwari@hotmail.com

## Diyardeya çavlideriyê

Pir caran di civatan de mirov dibihîze ku ev mêr an ev jin çav li der e, erê wateya wê çi ye? Çav li der ji bo wî kesî tê gotin çi jin an mêr zewicî be û di ser hevalbenda xwe yan hevalbedê xwe re dilê xwe bide kesekî din bi riyên ne şerîatê, bê guman ev jî îxanet e di navbera jiyana jin û mêran de.

Bi piranî sedemê vê diyardeyê çi ne? Pir caran di civaka me de çaxê keçek dilê xwe dide kesekî di jiyanê de û hemû hêviyên xwe bi wî kesî ve girêdide, lê li dawiyê bi darê zorê didin yekê din ku bi çi tiştan ve nêzî hevdu nîn in. Bêguman dilê wê keçê dişikê û çi car nikare hez wî bike yê bi zorî dayê. Lê herdem di xeyalên xwe de li gel wî kesî dijî yê ji dil ji bo xwe hilbijartî. Bêguman ew mêrê şopê kirî çi xweşiyê di gel naborîne û wek hest û soz ew keç çi car nabe milkê wî. Pir caran ev zor berê keçê wek tolhildan dide reftarên ne ciwan bi şêweyekî li dawiyê navê wê bi xirabî diçe dibe bê kuştin jî. Lê ger ev sedem nebin jina kurd her tim ji bo malbat û mêrê xwe dilsoz û paqij e. Lê piraniya mêrên kurd ger jina wî pir bedew ji be lê dîsa ji derveyî malê ger jineka normal jî bibîne dê li ser jina xwe re dê dilê xwe bidê, lê dîsa vê jî sedemên xwe hene ji wan:

1- Jina kurd di civakekê de perwerde bû ku dibêje (jina şermîn bi şarekî lê mêrê şermîn bi karekî) wate li gorî civaka me çendî jin şermîn be, bi şeref û namûstir e. Jina kurd li ser van kevneşopiyan perwerde bûye û şermê kesatiya wê dagir kiriye. Lewma şerm dike girîngiyê bi mêrê xwe bide û zewqê bû çêke. Li gorî jinê çendî xwe li ser mêrî giran ke baştir e.

2- Ji aliyek din ve heta niha jina kurd di nava welatekî de ye ku her tim şer, girtin û kuştin heye, ev yek jî dibe sedemê dil şikestinê li ba jinê. Bi şêweyekî jin girîngiyê bi bedewî û roxsarê xwe nade. Dîsa çavdariya xwe nake ku her tim bi rengekî xwe biguhere û bedew bike. Her jin zewicî li gorî wê êdî karê wê tewaw, bêgumam ev yeke hemû dibin sedemê hindê ku jin nikare çavên mêrê xwe tijî bike. Êdî berê mêrî dikeve ji derve û girîngiyê nade jina xwe. Her jinekê ji derve bibîne dê çavên wî çinê ji ber ku dilê wî ji jina wî reş bûye. Sedemê vê diyardeyê vedigere bû jinê, pêwîst e jin her tim li ber çavên mêrê xwe rêkûpêk be. Girîngiyê bide mezherê xwe, her tim bila bêhna gûlavn jê bifire, her tim bi şêweyekê xwe nîşanî hevalbendê xwe bike da ku berê wî nekeve ji derve.

## Li Başûr 2 jinên din jî xwe şewitandin

Hate îdiakirin ku li Hewlêrê û li bajaroka Ranyayê keçek û jinek ji ber arîşeyên malbatî agir berdan bedena xwe. Li taxa Sêtaqanê ya bajarê Hewlêrê ji ber arîşeyeke malbatî keçeka 28 salî ya bi navê Z.T. agir berda bedena xwe. Di heqê wê bûyerê de çavkaniyek ji Nexweşxaneya Lihawarçûyê ya Hewlêrê di daxuyaniyeke taybet de ragihand ku ew keç niha di çavdêriya hûrgilî ya bijîşkan de ye û ji ber zêdebûna rêjeya şewatê jiyana wê di metirsiyê de ye. Wê çavkaniyê da zanîn ku polîs di heqê bûyerê de dest bi lêkolînê kiriye.

Bi heman awayî li bajaroka Ranyayê ya ser bi parêzgeha Silêmaniyê jineke 36 salî ya bi navê F.M. ji ber arîşeyeke malbatî agir berda bedena xwe. Piştî bûyere ew jî rakirin nexweşxaneyê û çavkaniyeke nêzik ji bûyerê amaje bi zêdebûna rêjeya şewatê wê dike û diyar kir ku gefa kuştinê li wê hatiye xwarin.

www.arsivakurdi.org

# Bê nasname jiyan û bê nasname binaxkirin

## Heta ku gerîla Amed çîroka xwe anî ser ziman, jan bi dilê wî diket, laşê wî direcifî û êş ji çavên wî difûrî. Gerîla Amed di hevpeyvîna xwe de çîroka xwe her çiqasî zor be jî bi lêv kir

Dunya PALE / BEHDÎNAN - ANF

Mirovekî navê wî kurd be li ku derê dibe bila bibe tê inkar kirin. Nasname û çanda wî tê redkirin. Ne tenê dewleta tirk di heman demê de ji milê hemû dewleta ve mexdûrî heman polîtîkaya inkar û îmhayê dimînê.

Di dîrokê de gelê kurd ji milê desthilatdaran ve bi komkujiya re derbas bûye. Bi awayekî li ber çav di pir bûyere de derbas bûye. Lê belê niha di milê aborî, siyasî, çandî û bîrdozî de têne kuştin û jiyana li wan tê heram kirin. Di roja îro de ji mafên xwe yê jiyan kirinê têne mehrûm kirin.

Ma qey li ser aniya kurdan hatiye nivîsandin ku herdem bindest, bê nasname, bê ziman bimînin û koçbertî herdem para wan be. Sînor bûye kabûsê xewnên şeva, li ser wî sînorî mayîn û têl hene. Gelê kurd di ruh, mejî û di dil xwe de bi têlan hatine dorpêçkirin.

Jiyana gerîlayekî kurd jî bi têla hatiye dorpêç kirin. Ne tenê ji ziman û nasname xwe mehrûm ma ye. Di heman demê de ji bav, dayik, xwişk, bira û ehlên xwe mehrûm ma ye.


Gerîlayên kurd Egîd Amed li Amedê sala 1987'an hatiye dinyayê. Di 2009'an de beşdarî refên gerîlayan bûye. Lê belê di temenê xwe yê yek salî de ji şewata agir nekariye çavên xwe veke. Dewleta tirk di temenê wî yê yek salî de ew ji her tiştî mehrûm hiştiye. Çîroka wî pir bi jan û êş e. Heta ku gerîla Amed çîroka xwe anî ser ziman, jan bi dilê wî diket, laşê wî direcifî û êş ji çavên wî difûrî.

Gerîla Amed di hevpeyvîna xwe de çîroka xwe her çiqasî zor be jî bi lêv kir û wiha dest pê kir: "Ez di 1987'an de hatim dinyayê. Ez li Farqîna Amedê hatime dinyayê. Ez nû diketim temenê xwe yê yek salî de. Hîna min bîr nedibir, hîna min germahiya himêza dayîka xwe hîsnekiribû, hîna ez navê dayik û bavê xwe fêrnebûbûm, leşkerên tirk bi şewata gundê me, dîroka min bi hibra reş xîz kirin. Qedera min radestî tarîtiyê kirin.

Dema ku dijmin gundê me dişewitînê dayik û bavê min dişewitin û wisa jiyana xwe ji dest didin. Mal û mulkê ehlên gundê me hemû têne şewitandin. Gund di nava pêt û çirûskên agir de dimînê. Kesek nizanê kî saxe û kî jiyana xwe ji dest da ye.

Piştî ku dijmin agir berdide gundê me, tên dinêrin ez hîna sax im û min digirin gel xwe. Piştre min davêjin ser riya Rihayê. Kalekî kurd dema ku di rê de min dibînê, min digirê gel xwe û min xwedî dike. Lê belê piştî ku lêkolîn dike dibihîsê ku gundê me ji aliyê dijmin de hatiye şewitandin. Lê belê nikarê nasbike ez ji kîjan malbatê me. Ew kalê kurd dixwazê bavtiyê ji min re bike, lê belê emrê wî têrê nake. Nikarê min xwedî bike û dizanê dema ku bimirê ez ê dîsa tenê bimînim. Ji ber wisa dema ku malbateke Kobanê ji Başûrê Rojava têne ziyareta Tirkiyeyê, min radestî wan dike.

Ew malbata Kobanê ya ku ji Başûrê Rojava hatiye ziyareta Tirkiye min bi xwe re dibin Başûrê Rojava. Wê malbatê ez mîna lawê xwe xwedî kirim.





**Helwesta dewleta Sûriyeyê**

Di dewleta sûrî de însanên hemwelat hene û yên biyanî hene. Ew mirovên ecnebî û koçber têne naskirin dewleta sûrî nasname nadê wan û wan ji her tiştî mehrûm dike. Xwedî li wan dernakevê. Mafên wan yê xwendinê nîn e. Nasnamê nade wan ji ber wisa nikarin herin dervî welat jî. Lewma min jî nikarîbû ez bixwînim. Kesekî min qebûl nedikir."

Gerîla Amed di di nava gotinê xwe de anî ziman ku PKK'ê xwedî lê derketiye û wiha berdewam kir " dema ku Rêber APO çîroka min bihîst ez kişandim gel xwe. Di hemû milan de ez perwerde kirim û xwedî li min derket.

Rêber APO ez radestî malbatên kurd kirim ji bo ez bikarbim zaroktiya xwe bijîm û xwe fêrî xwendin û nivîsandinê bikim.

Dayikên kurd heta ji destê wan hat dayiktî ji min re kirin. Bi qedir û qîmet nêzî min bûn. Ji bo ez hestên zarokekî sêwî jiyan nekim, bûn xwediyê çabayekî mezin.

Her çiqasî malbatê kurd xwedî li min derketin, lê belê min ji bîr nekir ku gundê me bi destê dijmin hate şewitandin, dayik, bav, xwişk û birayê min bidestê dijmin sax hatin şewitandin. Lewra kîneke mezin di dilê min de kom bibû. Ez herdem li bendê bûm ku emrê min mezin bibe û ez heyfa hemû mirovên kurd yên ku bi destê dijmin hatine şewtandin, qetil kirin û di zîndana de riziyane, rakim.

Berê gundên kurdan dihatin şewitandin ji ber wisa koçber dibûn. Lê belê niha birçî dimînin ji ber wisa mecbûrî koçbertiyê dimînin. Dewleta tirk ji hêza gelê kurd ditirse lewma herdem dixwazê wan cahil bihêlê yan jî wan bihelînê û ji nasnama wan dûrbixînê. Ev polîtîkaya ne tenê li Tirkiyeyê tê jiyîn. Di heman demê de li sûrî jî vê polîtîkayê li ser gelê kurd dide meşandin.

Heta ji destê dewleta sûrî tê gelê kurd înkar dike. Bi nasname û zimanê kurdî îtiraf nake. Ji bo kurdîtiya xwe inkar bikin, hemû rê û rêbazên qirêj li ser gelê kurd dide meşandin, Bi birçîbûnê, girtinê û qetil kirinê dixwazê çavê ciwanên kurd bitirsînê û wan ji têkoşînê bide dûrxistin".

**Bêwijdaniyê dikin**

Gerîla Amed girtina zarokên kurd di emrekî biçûk de wekî bêwijdanî nirxand û wiha anî ziman: "Dewleta tirk bi polîtîkaya birçîbûnê xwest berê zarokên kurd hînî tîryak, dizî, fihûş û xirabiyê bike. Nikarîbû bibe asteng li pêşiya xwesteka zarokên kurd yê ku birçiyê jiyaneke azad in. Azadî ji wan re ji av û nan bi rûmetire.

Ne bes e zarokên kurd bê bav û dê dihêlin. Dest bi girtinê kiriye.

Dewleteke ku zarokên di emrê deh salî de pênc salî de digirê yan jî qetil dike pêwîst e muhakemeya wijdana xwe bike. Her mirovekî zane vê polîtîkaya dewletê wekî bê wijdanî û bê axlaqî dinirxîne. Ne bes e dijmin zarokên kurd di lêgerîn, xeyal, ruh, mejî û dil de dide kuştin. Êdî destpêkiriye fizîkî jî dide kuştin û wan di zîndana de dide rizandin"

Gerîla Amed di dawiya gotinê xwe de bang li ciwanên kurd kir ji bo beşdarî gerîla bibin.

Ew vexwendî têkoşînê kirin ji bo jiyana azad bidin avakirin.

Ev girtina zarokên kurd di temekî biçûk de, ne tenê gelê kurd hemû mirovahî vî nêzîkatiyên li dijî zarokên kurd napejrînê.

Dewleta tirk zarokên kurd dide girtin û qetilkirin. Dewleta Îranê hem ciwanên kurd digirê, qetl dike û hem jî bidarvedike.

Dewleta dûrî jî zarokên kurd ji ber ku nasname xwe dixwazin û zimanê xwe dixwazin têne girtin û jiyan li wan tê mehrûm kirin.

Ev rewşa zarokên kurd ku dijîn pêwîst e mirovahî çavên xwe jê re negirê û bê deng nemîne.

# Di zemanekî de yê ku jiyan diparast peykertraşek bû

ZÎN EVÎNAWELAT

Di her devera erdnîgariyê de şêweyê huner ji dîrokê heta niha bi gengazî heye. Lê wekî keda vê dawiyê, dîroka hunerê berî serdema derbasbûna şaristaniyê di Mezopotamya û Misrê de dest pê kiriye. Di vê beşê de em ê bi kinahî li ser hunera erdnîgariya Mezopotamya û Misrê bi sekinin.

Herkes dizane asoya dîroka Misrê, ew çiyayên wek kevirê kîlometre çikiyane, bi talana mirov û zeman re rû bi rû hatine lewre wek welatê pîramîda dizanin. Her çiqas dûr û nepenî diyar jî bin di rastî de gelek tişta ji me re dibêjin. Ew behsa temenê qralekî ji me re dikin. Di wî temenî de ew kevir û stûnên wekî dêwa çawa hatine çikandin û bi gengaziya vê re welatê bi vî awahî hatiye rêxistin kirin didin diyar kirin. Di vî welatî de bi hezaran karker û mirovê dîl girtî ji bo madena ji nav axê derxin û bînin qada avahiyê, heta gora qral temam bibe bi sala çawa tên bi kararîn ji me re dibêjin. Ev kevir hemû bi navgînên ne pêşketî yek bi yek tên rêzkirin û bi hemû dewlemendiya xwe behsa wan qrala dikin. Tu qral û tu komika civakî ji bo tenê (anit) bîrdariyekî biçikîne wan zehmetiya nadin ber çavên xwe. Lê di çavê qral û evdê wî de bikaranîna van pîramîda de nepeniyek heye. Qral wek hebûnek pîroz li ser gelê xwe desthilatî pêk tanî. Wisa di hat hesibandin. Dema ji vê cîhanê goçber dibû, diçû qada xwedayan. Ew qada ku jê hatibû. Dema ew diçû berbi asîmana ve ev pîramîd li gorî texmînî di derketina wî de hêsanî pêk tanîn. Lê berî her tiştî ê bedena wî pîroz bi parastina. Ji ber misrî bawer dikirin ku ji bo ruh di cîhana din de jiyana xwe bi domîne pêwîst e beden bê parastin. Ji ber vê beden bi gelek rêbazên cuda mûmyakirinê di pêçan û ne dihiştin cesed xera bib e. Pîramîd ji bo qral avadibe û cesed di navîna vî çiyayê kevirî de di nav gorek kevirî tê bi cih kirin. Di odeya mirî de li ser dîwara û hemû hawîrdorê, ji bo rêwitiya qral ji vê cîhanê wêdetir hin xêzikên efsûnî ku bi qral re bibin alîkar xêz dikirin. Di dîroka hûnerê de di derbarê rola baweriya kevnare de yê ku bermahiya dîrokî bi xwe re anîne ne ev mîmariya mirova tenê ne. Ji bo misriyan tenê beden parastin ne bes bû. Ger aliyê qral yên diyar jî wenda nebûna wê demê heta dawiyê yê qral jiyan bikrana. Ji ber vê hin peykelgera xwestin li ser kevirê Granîtê çetîn portreyekî qral bikolin. Vê xeyala qewartinê ji bo ruh bi saya van xeyala (îmge) jiyana xwe heta dawî bi domîne datînin cem gora qral cihekî veşartî. Nava peykelger wê demê bi gotina 'kesê jiyanê di parêze' hemwate bû. Merasîmên dişibiyan hev destpêkê tenê ji bo qral çêdikirin. Piştre nijada qral hemû hêdî hêdî di rêzê de hat bicihkirin û gora wan jî wisa hatin çêkirin. Her dem derbas bû, kesên girîng(!) ji bo tedbîrê cîhana din bigrin, rihê xwe bê dawî bikin, ji bo xwe xwarin, vexwarin û mûmya di qewêtînin. Silala çaremîn a qrala herwiha ya dema pîramîda ji wan portreya ye. Ev hûnerê Misrê herî bilind in. Di wan de şemalek mezin û zelaliya bi hêsanî nayê ji bîr kirin heye. Diyar e ku peykertraş ne xwe sipartine van modelan û ne jî wekî dema derbaskirinê nêzî karê xwe bûne. Tê fêmkirin têkildariya peykertraş bi cewher re ye. Dev ji hemû kite kitên din berdane. nepeniya vê hunera me ewqas bibandor dikin,dibe ku li ser hêmana peykelê serê mirov seknandin be. Ji ber her çiqas di hişkbûnek geometrîk de be jî cardin çava ne rehet nakin ev afirande (eser). Bi çavdêriya xwezayê ewqas bi pîvan hatiye teraz kirin, ya rastî ev me bi wan bêdawîbûna bandor dikin.

Bê guman Misir yek ji wan şaristaniyê bi hezaran salan li Rojhilata Navîn hatiye jiyan kijiyîn e. Mezopotamya bi zimanê Yyewnanî tê wateya 'geliyê di navbera du çeman de'. Em hûnera Mezopotamya ji ya Misrê kêmtir nas dikin. Di geliyê vê erdnîgariyê de kevir jî hebûn lê piraniya binesaziyan bi axa qemirandî di hatin çêkirin. Ev axa qemirî heta demkê li hember ba û babîsoka li berxwe dida lê şûnde di bû toz û difiriya. Peykerên kevirî gelek kêm bûn. Lê sedema negihandina wê hunerê heta dema me ne ev e. Sedema yekemîn wan wekî misriyan bi tarzê jiyana mirovan li cîhana din bawer nedikirin. Di pir kevin de di paytexta xanedana Ur de ji bo qral li cîhana din ji xizmetê bêpar nemînin bi hemû kole û xizmetkarê xwe re di hatin veşartin. Hin navgînên di wan goran de hatine dîtin îro li muzeya Brîtîsh a Londonê de tên pêşkêş kirin. Ev navgînê mijara gotinê bi gelek nexşa hatine xemilandin.

Hunermendên Mezopotamyayê, piranî serfiraziyê xwe yê şer û pevçûna li ser qewartina wêne kirine. Piştre ev huner veguherîne çîrokê merasîmên qrala yên fermî. Ji van çîrokan ê herî parastî xwedî demek gelek dûr e. Di pirtûka pîroz de nebiyê tbi navê Hz. Silêman û şûnde hatiye çêkirin. Di Bz. Serdema 9'an de qralê duyemîn Asûrnazîrpal de hatine çêkirin. Di van wêneyan de mirov dikare hemû demê şer bi awayekî rêzkirî temaşe bike. Dema li van hunera tê nêrîn wek mirov li fîlmekî berî niha bi hezaran salan temaşe dike. Ev dîmenên rastî û zindî ne. Dîmekî di wan dema de xwe werimandin û propaganda pêşketiye!

Piştre ev peyker bi lezgînîyekê derbasî Anatoliyê û Yewnanistanê bûne, îro dewlemendiya xwe ya herî mezin di parêzin. Huner û peykertraşiya Mezopotamya xwedî dîrokek dewlemend û kevnare ye. me di vê beşê de xwest dîroka Misrê ûyê Mezopotamyayê bînin pêşberî hev. Le ev dîrok ji ber dewlemendiya xwe pêwîst e bi awaykî xweser li ser were seknandin. Em ê di nivîsa xwe ya din de li ser hunera Mezopotamya bi awayekî xweser bi sekinin da ku em bi karibin şerefa wê ya hunerê cardin bidinê. Em ê nêrîna duh û îro binirxînin.

# CÎK: Ziwanê makî înkarkerdiş kufr o

## Boykota TZPKurdî her ke şino veng dano. Na ray zî CÎK paştî da û waşt ke heme sazî û komelana oldar û kesîy ke Homayî ra tersenê û şermayenê wa sûreyanê ayetan bidê şarî ver, heme çî zelal o. Qabê birayanê ma kurdîy ziwanê xo qisey bikerê xebat ferz o




**AMSTERDAM / ANF** - Civaka Îslamî ya Kurdistanî CÎKî, semedê boykota TZPKurdîy daxûyaney da û ard ziwan ke, paştî danê boykota qabê ziwanê makî. "Xoma (cc) çîyê dawo ma ziwan nîmetê yo. Kesanê ke ney înkar bikê kunê kufrî."

CÎK daxûyaneya ke bi nuşteyî da di, ardo ziwan ke, bal anta Kuranê Kerîmî di sûreya Rum ayeta 22'an ke tede vajîyeno: "Pirtûka Homayî ya Quranî kerîmî di, Sureya Rum ayeta 22 di hina kerem kerdewo: Bi virazyayişê asîman û erdî û ziwanîy û renganê şima hemeyî bi ferq êy, çimkî ayetê ey ra yê. Bê guman, no çîyî qabê zaneyan îbretîy estêy."(Rum 22)

Homa (cc) raya siteyine Pêxemberê ma HZ. Muhemedî ra vato 'biwani'. "Wendiş encax nîmeta ke kesanê bişikyê qise bikerê yo. miletê miletê ra cîya kerdiş encax bi ziwanê înan beno miletî xo mîyan di bi ziwanî dayiş û sendiş kenêy, no zî nîmetê yo."

Di daxûyaney di: "Mafê kurdan û gedeyanê înan esto ke bi ziwanê xo qiseyan bikerê. Encax zafêreya sazî û dezgeyanê tirkan ziwan û mafanê kurdan înkar kenêy û qedexe kenêy. Qedexekerdişê kurdîy eynî waxtî di, yeno maneya înkarkedişê kurdan û îmhakerdişê înan."

"Di ziwanê makî di perwerdehey înkarkerdiş di dînê ma di kufur o." Û hina vatêy: "Kesanê ke Homayî ra îtîat kenêy lazimo ke hemeyî ney sûcî vero xebat bikerê. Birayanê înan êy kurdan ra alîkarey bikerê. Kurdîy tenê wazenê bi ziwanê makî ya xo qisey bikerê û perwerdeya ey bi hawayê fermî bivînê."

"Ardê ziwan ke mafê kurdan o ke hewteyê dibistanan boykot bikerê. Cayê di ziwanê bîyanijî miletê sero ferz vînayiş sûcê merdimahey ya herî adî yo. Qabê no bêro wedaryayiş ra heme çî rewa yo."

CÎK veng da heme muslimanan û vat:

"Waştişê kurdan yê bi ziwanê xo perwerde vînayiş mafê înan yê bi medimahey ra wo. Înkarkerdişê ziwanê kurdan vero têkoşîn kerdiş, hereketê de roşnî kerdişî yo. Her şar di ziwanê xo di şitil dano. Heqê kurdan ê xozayî yo. Şarê bê ziwan çîno û wiş beno. Vengdayişê ma qabê heme cemeat û komanê Kudistanî ra esto ke, wa ziwanê makî waştiş bîyayişê şarê keno binê xarantîyî. Kurdîy gere binuşê. Verê înkarî û îmhayî di, ziwanê xo di perwerde û eynî waxtî di eştbîyayişê têkoşînî berz keno."

Tikey cemeat û komalî ze ke maf waştişê kurdan terorîze kenêy ra zî vatêy:

"Armanca kurdan ya ke gedeyanê xo merêşê dibistanan çîno. Kurdîy gama ke bi ziwanê xo wendişî estêy. Û wazenê ke ney ra pey bi ziwanê xo perwerde bivînê û ziwan kurdîy bibo fermî."

Ma veng danê heme îmaman û merdimanê oldaran. Ola îslamî di înkarkedîş sûcê herî girdan ra wo. Wa dijî înkarkedişî di merdimî bêrê roşnî kerdiş.

Wa bêro zanayiş ke Homa merdiman senî bi ziwan û rengan cîya kerdo bidê zanayiş û bi dê zanayiş ke heqê rewa yê merdiman û kurdan esto ke, ziwanê xoyê makî biwazê. Quranî kerîmi ra zî wa bi ayetan bivajê û paştî bidê mafê merdimahey."

"Înkar kufurê yo. çîyê de tek esto o zî Homa yo. Verê kurdan di 'yew milet, yew ziwan, yew dewlet û yew al' sûc o. Ma nêbêy hemparê ney sûc î û verê ney di têkoşê ke qata Homayî di ma daha weşanra bibêy. "

# Şaredareya Erxenî û xebata ay

**Ehmedê BIRA - AMED**

Şaredareya Erxenîyî semedê xebatanê xo yê weş û çiman vero ra, şar pesnê ay danê. Şaredarey na gam zî di xaçerayîra zereyê sûka kan di kûpê de gird ya verî qabê şerab û dims/aqit kerdê de viraşta.

Şaredareya Erxenîyî her ke şino, bi xebatanê xo yê weşkerdişê Erxenîyî şar pesnê ay dana. Şaredareyî hetanê ney gamî bi gilokine sifte problema awî ya Erxenîyî bi sontajanê ke koyê Zilfî Pêxemberî di day piro, na gam hal kerda. Rayîra Amed Elezîzî sero xaçerayîrî fek di parkêdê zaf weş viraşta. Qinalîzasyona ke nezdî sanayîya tamîra wesayitan di bi borîyan girota. Kuçeyanê ke şar tedera zaf şinê û yenê na amnanî ra wo ke ci dana bi kereyanê parkê qab bikera. Cadeya koyê Zilfî Pêxemberî parkê kerd û çor di cayanê ke talûkeya rayîrî bi beton kerd ke qezayî nêbê şar daha rehet şêro û bêro û ze nêy xebatan zaf xebatîy kerdî.



### Şar şaredareyî hes keno

Şarê Erxenîyî mîyan di yeno vatiş ke, hetanê ney gamî şaredarêya winayine nîyamewo Erxenîy. Ney sero zafêreya şarî cira razîyo.

### AKP'îj zî şaredar ra razîyê

Hetanê kesanê winayine vanê mîyandi kesanê ke raya xo dayê AKPî zî estêy. Şarî ard ziwanke, kesanê ke zexmetîyanê şaredareyî zanenê daha weş zanê ke na şaredarey xizmetanê senî kena. Çimkî çica problemê esto hetanê ay ra yena problemî bi derfetanê xo hal kena û şarî vat: "Ma şaredarey ra wazenê ke tikey kuçeyanê ma di hewna qinalîzasyon bi bîranê tiweletî hal benêy. Ney ra ma wazenê ke wa qinalîzasyon ey cayan bêrê viraştene. Ney cayan ra yew taxa Şîrînevlerî ra tikey cayî yê."

# Fîlmanê Altin Kozayî dest pê kerd

**EDENE / DÎHA** - Emser fîlmên Altin Kozayî ya 17'in bi fîlma "Cenîya ke pîyanoya ay çîno" dest pê kerd. Galaya ey ame viraştene û starta fîlman ame dayene.

Salona Şaredareya Edeneyî ya Tîyatroyî di galaya fîlmî ame viraştene. Hetê endamanê jûrîyan. Zaf humarey di kaykerdoxanê sînemeyan zî beşdarê galayî bîy.

Verê galayî di wekîlê walîyê Edeneyî Fîkret Denîz qalî kerdîy. Ey pey ra wekîlê şaredarê Gird yê Edeneyî Zihnî Aldirmaz û Mudurê Pêroyinê Sînemeyan û Wezareta Turîzmî Heqê Telîfî û Çandî Huseyîn Ulger zî qisey kerdîy. Ulgerî ard ziwan ke Tirkîya di 2009 di 70 fîlmî ameyê antene. Nêy fîlman ra zafêrey qada navnetewî di xelatîy girotêy.

Galaya mîhrîcana fîlmanê emserine, İşil Ozgenturk serekeya jûrîyê Fîlmanê Metrajê derg kena. Ozgenturkî plaketê da kaykerdoxanê fîlma "Cenîya ke pîyanoya ay çîno" ya Jan Budara yî. Pey plaketî ra, hunermend Goksel, sahne girot. Mijara fîlmî cenîya mêrdînij ka cuyê ay şewê di senî bedilyena giroto xo destan.

Encamê fîlma ke xelat bigo dê peynîya fîlmanê ke beşdarê mîhrîcanî bîyê hemeyî bêrê temaşekerdiş ra pey dê bêro eşkera kediş.

# Rojanê vêrîn de artêşa tirkî ser cesedê gerîlayan wehşet kerdo

**SERKO LOIJ**

Nê rojanê peyin de ordîyê tirk cesedê gerîlayan rê vaşet kerdo. Sare, herme, û lingî ci ra kerdê, taye cesedî ebi kîmyayê amê vesnayene. Maw û pîyê ke cesedê domanê xo perçbîyaye û vesnaye dîyê, nêşikîyê ke raya peyine qayitê rîyê laz ya kî ceneka xo bikerê. Maw û pî hona binê şok der ê û zere veşnenê, hama sareberz û haştîwaz ê, jê maw û pîyê tirkan qalê qirkerdene nêkenê.

Wertê ê gerîlayan de her cayê Kurdistanî ra domanî estbî, Dêrsim ra hata Afrîn, kurmanc, zaza, soran, alevî û yezîdî pîya dopêro û pîya ginê hard, pîya vaşetê ordîyê tirkî dîyê. Jû mawa zazayê diyarbekirî ze nîya vana: "Ez zanena ke herb o, herb de însanî mirenê, feqet eşkerê tirk sarê lajê mi birnê, cesedê xo perçe kerdê."

Na maye çand roj yo nûn û awê nêwena, serva merdene kûta ra.

Ju mawa dêrsimize ke lajê xo Gumushanê de şehîd bîyo, nîya vana:

"Ma şîme Trabzon serva ke cenazeyê lajê xo bîyarîme. Şimê zerê morgî, ûca cesedê gerîlayan estbîy pêser, cesedî vesnaye bîy û boy kewtibîy. Merdim boya cesedan vera neşikîyenê zerê de bimano. Selayatdarî/Yetkîlîyî amênê ke ma bikuyê, ma rê xever dê, haqeret kerdê. Ma pê cenazeyê laze xo cerayîmê Erzingan, ûca kes hetê ma ser nêama, Cemevî de nêvardeyê ke meftê bişunîme. Endî bes o, ma wazenîme na mesela endî hal bo, ebi kîştene û hêfgûretene dewlete na mesela hal nêkena."

Zeke şima vînenê, maw û pîye kirmancî honde barbarîye vera onca haştîye wazenê, gon û iştîra bîyê bezar û barbaran rê destê însanîye kenê derg, çi heyf ke barbarî ney fam nêkenê. Barbarî hala dota vinderê, êyê bîn kî nêvînenê.

Hetê tirk ra qe veng nêvejîno, sosyalîst, dîndar û eyê ke xo demokrat vînenê bîye lal û ker. Sarê tirk lal bo, ker bo, kor bo hama nê guneyî, barê vilê înan o, ma xo vîra nêkenîme. Hetê kirmanc her ke sono beno xirt, çike raya haqîqat der ê, na rastîye kolonyalîst xêrepneno.

Gerîlayî bêwayîr nîyê, ma sond werdo, nêhaqîye vera hata ke xaxanê bişikîye xo ver oncenîme.

www.arsivakurdi.org

# Têgeha 'Pêşeroj' û 'Paşeroj'ê

DEHAM EBDULFETAH

Em dizanin ku zimanê kurdî demeke dirêj wekî zimanekî devikî maye. Li dirêjahiya wê demê jî derfeteke dîrokî bidest neketiye da ku bibe zimanekî nivîskî û xebateke zanistî jêre bibe. Ji ber vê rewşa dîrokî gelek kêşe û arîşeyên aloz di zimanê me de peyda dibin, divê em wan destnîşan bikin, li ser wan rawestin û wan çareser bikin!

Ji wan aloziyên kêşedar navê dema ayinde ( musteqbel)e, ku di navbera navlêkirina (Pêşeroj) û (Paşeroj) de bûye cihê têvelî û ciyawaziyê. Rewşenbîrên Kurd, nemaze yên ku bi Kurmancî dipeyivin, derbarî navlêkirina dema ayinde (duwaroj) bûne dû beş:

A - piraniya rewşenbîrên Bakur û Rojava ( Tirkiye û Sûriye) gotina "Pêşeroj" bi wateya dema ayinde (musteqbel) dixebitînin û gotina "Paşeroj" jî bi wateya dema borî (mazî) dixebitînin. B - rewşenbîrên kurd li Başûr û Rojhilat (Iraq û Îran) gotina 'Paşeroj' bo dema ayinde (musteqbel) bikar tînin û gotina 'Pêşeroj' bo dema borî bikar tînin.

An ku, her du beşên rewşenbîran, wan navlêkirinan berevajî hev bikar tînin. Bêguman her beşek ji wan rewşenbîran navlêkirinên xwe bi hin eger û behaneyan dane pêş û ew pesend kirine. Ez jî, wekî xemxurekî zimanê kurdî, bawer dikim ku gotina 'Paşeroj' bi wateya dema ayinde rast û durist e.

Bi wê baweriyê jî, ji mêj ve, min ew gotin di nivîsên xwe de, bi wateya dema ayinde xebitandiye. Helbet, min jî ew baweriya xwe li ser çend behaneyan ava kiriye :

**1-** Ew kesên ku peyva 'Pêşeroj' bi wateya dema ayinde (musteqbel) bikar tînin, ew kes xwe dikin pîvanok û her du hevalkarên (hoker) 'pêş' û 'paş' li xwe dipîvin û dibêjin : -Pêşeroj: Rojên li pêş me, yên ku hêj nehatine û me ew nedîtine, lê hîn wê bên û em ê wan bibînin (musteqbel).

-Paşeroj : Rojên li paş me, yên ku me ew dîtine û di ser me re buhirîne ( dema borî ).

Bi vê têgeha demê jî hemû mînakên xwe yên ronîker şirove dikin, wek : -"Di berbanga sibehê de limêjên wê rojê, yên li pêşiya mirov (yên musteqbel) nîvro, esir, mexrib û îşa ne. Di esrê de êdî limêja mexrib û îşayê bi tenê li pêşiya mirov dimînin, yanî musteqbel in, lê limêja nîvro û ya sibehê buhirîne, li paş mirov mane...".

Dema ku mirov cara pêşîn vê mînakê dixwîne guman dike ku demên limêjên destnîşankirî rast û cîgirtî ne. Lê ku mirov li deqqa mînakê vegere û wê bi hûrbînî bixwîne dê bigihêje baweriyekê ku ew gumana wî ne di cihê xwe de ye!

Şaşiya ravekirina vê mînakê jî şaşiya wan kesan hemûyan e, yên ku gotina 'Pêşeroj' bi wateya rojên li pêşiya me (musteqbel) dixebitînin. Ew şaşî jî ew e, ku navekî razber (manewî) wek (dem) ku li navekî heyber (madî) hatiye pîvan û hevkêşiyeke ne rewa ji wan saz bûye, wekî ku di mînaka çûyî de hatiye :

-"Di berbanga sibehê de demên limêjên wê rojê, yên li pêşiya mirov (yên musteqbel) nîvro, esir, mexrib û îşa ne…".

Anku, di berbangê de limêjên li pêşiya mirov nîvro … Ya rast û rawe ew e, ku demên limêjên mayî li dema berbangê bên pîvan :

- [ Di berbanga sibehê de demên limêjê yên wê rojê, yên li paşiya (dema ) berbangê (yên musteqbel) nîvro …. û îşa ne ]

Anku limêjên nîvro, esir, mexrib, îşayê li paş limêja berbanga sibehê ne.Di parçeyê mînakê yê dawî de :

-"...Di esrê de êdî limêja mexrib û îşayê bi tenê li pêşiya mirov dimînin, yanî musteqbel in, lê limêja nîvro û sibehê buhirîne, li paş mirov mane. Dîsan ew şaşiya pîvanê bixwe ye. Mirov bûye pîvanok û demên limêjan lê tên pîvan :

-Di esrê de : - Limêja mexrib û îşayê li pêşiya mirov in (musteqbel).- Limêja nîvro û sibehê li paşiya mirov in, buhirîne ( borî).

Rastiya pîvanê ew e ku dem li demê bê pîvan, ne li mirov bê pîvan : -( Di esrê de : - Limêja mexrib û îşayê li paş ( limêja esrê ne anku dema mexrib û îşayê li paş dema esrê tên.

-Limêja nîvro û sibehê jî li pêş (limêja ) esrê ne.

Anku dema nîvro û sibehê li pêş dema esrê buhirîne (borî)ne.

Bi vê pîvanê jî em dikarin gotina 'Pêşeroj' û ya 'Paşeroj' rave bikin : -Pêşeroj : Rojên ku li pêş vê roja me çûne ( ne ku li pêş me ne ), anku berî vê roja me buhirîne ( dema borî ).- Paşeroj: Rojên ku li paş vê roja me tên (ne ku li paş me mane), anku wê li pey vê roja me bên (dema musteqbel).

Yek ji aloziyên kêşedar navê dema ayinde ( musteqbel)e, ku di navbera navlêkirina (Pêşeroj) û (Paşeroj) de bûye cihê têvelî û ciyawaziyê

**2-** Ji hêla bêjesaziyê ve jî, her du gotin 'Pêşeroj' û Paşeroj " lêkdayî ne (hevbend) in û bi şêwazekî rêpîvan saz bûne, wekî ku tê gotin :

- Gul + sor = gula sor
- Mêr + kal = mêrê kal
- Jin + pîr = jina pîr
- Mar + kor = marê kor
- Ba + reş = bayê reş
- Av + xweş = ava xweş

Hwd…

Bi pêşxistina hevalnavan ( rengdêran ) û paşxistina navan, zêder ( veqetandek ) tên avêtin û ew mînak dibin :

- Gula sor = sorgul
- Mêrê kal = kalemêr
- Jina pîr = pîrejin
- Marê kor = koremar
- Bayê reş = reşeba
- Ava xweş = xweşav

Hwd…

Li gora vê pîvanê jî :

- Roj + pêş = roja pêş ( pêş vê roja em tê de )
- Roj + paş = roja paş ( paş vê roja em tê de ).

Bi pêşxistin û paşxistina nav û hevalnavan :

- Roja pêş = pêşeroj
- Roja paş = paşeroj

Bi vê dahûrînê em digihêjin baweriyekê ku gotina 'Pêşeroj' û ya 'Paşeroj' bi şêwekî rast û li gora pîvanê saz bûne.

Tîpa (e), ya ku di navbera her du hêmanên gotinên lêkdayî de ( pêş – e – roj ) û ( paş – e – roj ), tenê ji bo sivikbûn û rewanbêjiya bilêvkirina bêjeyên lêkdayî dikeve navbera wan. Anku, eger bilêvkirina gotinê bêyî (e)yê sivktir û xweştir be, ew (e) bikar nayê, wek :

-Sor + gul = sorgul
-Roj + hilat = rojhilat
-Şîn + boz = şînboz
-Ciger + xwîn = Cigerxwîn
-Dil + geş = dilgeş.

Lê ku hebûna (e)yê sivikbûnekê bide bêjeyê, hingê (e)bikar tê :

-Kesk + sor = kesk – e – sor = keskesor

-Penc + şêr = penc – e – şêr = penceşêr

-Pîr + merd = pîr – e – merd = pîremerdJi hêla rêzimanî ve, nebûna (e)yê rastir e, lê bi egereke fonetîkî (e) li van gotinan zêde dibe : ( Jinbî = jinebî, reşba = reş-e-ba ).

Bo vê egerê em dibêjin, her du şêwe ( Pêşroj, Paşroj ) û ( pêşeroj, paşeroj ) jî rast in, lê şêweyê bi (e)yê pirtir bikar tê.

**3-**Wateya gotina 'Paşeroj' di ferhengên zimanê kurdî de (yên ku li ber destên min) bi van têgehan hatiye :

A - Elî Seydo Goranî – " Ferhenga kurdî Nûjen ". (kurdî – Erebî):

-Paşeroj : (لبقتسملا ،رفول)

- El - wefir, el – musteqbel

B – Fadil Nizamiddîn – " Estêre Geşe ", ( kurdî – Erebî ):

-Paşeroj : - (لبقتسم ، قحال ، لبقم) - Musteqbel, lahiq, muqbil

C - Muhemed Cemîl Seyda –" Ferhrnga Jîn ", (kurdî - Erebî):

-Paşro ( paşroj ) : - (لبقتسم)

- Musteqbel

ç - Gêwî Mukriyanî – "Kurdistan", ( kurdî – kurdî ):

-Paşeroj : Dûwaroj (mustaqbel ) - Paşroj : Ayinde (mustaqbel )

d - Hejar Mukriyanî - " Henbane Borîne " (kurdî – Farisî ) :

-Paşeroj : - Le we duwa , ayinde, rojanî dûwem (Musteqbel )

ê - Selah Sadella – Ferhenga "Ingilîzî _ kurdî " ( ) :

-Future (Musteqbel) : Dûwaroj, ayinde, Paşeroj, Pêşdem. ê - D. Îzolî – Fergenga "kurdî - tirkî "

-Paşeroj : Istiqbal (musteqbel)

-Paşroj : teserruf

Berçav e ku van her heft ferhengan jî, gotina "Paşeroj" bi wateya (dema bê, ayinde, musteqbel ) Şirove kiriye. Tenê Selah Sadella di ferhenga "Ingilîzî – kurdî" de gotina Ingilîzî "future" bi dû wateyên hevdij şirove kiriye :

-Future – (Paşeroj)

- (Pêşdem)

Ez bawer dikim ku Sadella gotina "Pêşdem" bi mebesta (dema bê) xebitandiye, ne bi wateya wê ya rast : -Pêşdem : Pêşwext, Pêşeroj.

Ji ber ku ne durist e ku "future", di heman dem de "Paşeroj" û "Pêşeroj" be..!

**4-** Li herêma Dêrika Hemko û hin gundên dora wê, wek : (Endîwerê) jî ev derbirrîn carinan tê bihîstin : Te çi ji paşeroja xwe re kiriye ?!

Anku, te çi ji dawiya temenê ( musteqbelê ) xwe re kiriye ?!

Piştî vê ravekirinê em ê li çend gotinên gelêrî vegerin û wan li gora wê pîvana ku me amaje pê kiriye, şirove bikin :

-( Pêşiyên me ) : Bav û bapîrên me, yên ku di pêş vê dema me de jiyane ( dema borî )

-( Gotinên pêşiyan ) : Gotinê wan kesan in, yên ku pêş ( berî ) vê serdemê jiyane ( dema borî ).

-( Pêş (3) Salan ez çûbûm Wanê : Berî (3)Salan.

( dema borî )

-( Nuha em ê Şîvê bixwin, Paşê em ê herin civînê ) …

Paşî (dema) xwarinê ( ayinde, musteqbel ).

-( Paşîv / paş – şîv ) : xwarina (dema) paş

( dema ) Şîvê, di rojiyê de xwarinaŞevê ya ( Sihorê ).

-( Paşiyên me ) : Nevî û nevîçirkên me, yên ku di dema Paş vê dema me de wê bên.

Lê gotin û derbirrînên wekî van gotinan : [ Pêşveçûn û paşveçûn, Pêşverû û paşverû, Pêşketin û paşketin, pêşinyarî, pêşinyazî û pêşwazî ( istiqbal …).

Pêjina demê ( ne pêş û ne paş ) ji van gotinan nayê, Ev gotin, li gora pêvajoya hevokên wan, rewş, cih û pileya hizirvanî, zanyarî û şaristaniya mirovatiyê destnîşan dikin, wekî ku em bibêjin :

-Tu di xwendina xwe de pêşketî yî.( Tu di xwendina xwe de zîrekî, li pêş hevalên xwe yî ).

-Hûn malbateke pêşverû ne.

( Hûn malbateke, bi hizr, rewişt û têkiliyên xwe li pêşiya civaka xwe ne, hûn têgihiştî ne.

-Em çûn pêşiya wî ( îstiqbala wî ).( Bo rûmetdan û rêzgirtina wî em çûn pêşwazî û dîdariya wî ).

-Ev dara li pêş me hişk bûye.

( Ev dara li pêş / cihê / ku em lê ne … ).

( cihê darê li pêş cihê me ye )

-Dara li paş me Kesk e.

-( Dara li paş / cihê / ku em lê ne ….) ( cihê darê li paş cihê me ye )

-Em îro di roja çarşemê de ne.- Roja li pêş me ( li pêş roja me …) Sêşem e

-Roja li paş me ( li paş roja me ) Pêncşem e.

Di her çar mînakên dawî de, cih li cih hatiye pîvan û dem jî li demê hatiye pîvan, Pîvana rast jî ev e, ne ku em demê li xwe bipîvin,wekî ku tê gotin :

-( Roja li pêş me ) – pêşeroj e ?!

-( Roja li paş me ) – paşeroj e ?!

Li dûmahiya vê ronîkirinê dixwazim nêrîna xwe derbarî mijarê dubare bikim, ku gotina 'Paşeroj' bi wateya dema ayinde (musteqbel) rast û cîgirtî ye!

Vêca eger têbîniyên şarezayekî zimên derbarî vê nêrîna min hebin, yan jî nêrîneke dîtir hebe, hêvîdar im ku berçav bibin, daku em bi hev re mijarê gotebêj bikin û bi hev re vê kêşeya aloz çareser bikin …….-!! Ne duriste û nabe jî ku mijareke wisan giring wekî ( dema ayinde ) di zimanê me de bi du navlêkirinên hevdij ( dijwate ) bê nasîn û bê xebitandin. Bo vê yekê jî divê ev kêşe bilez çareser bibe!..

---

Evdile Koçer



evdilekocer@yahoo.com

## Zimanê tirkî boykot bikin!

Êdî dora boykotkirina zimanê tirkî ye!

Li bakurê Kurdistanê divê boykota siyasî vegere ser boykota zimanê tirkî;

Da ku siyaseta tirkî û tirkîzmê nikaribe êdî li Kurdistanê nefesê bistîne...

Da ku sînorên ziman û çandî yên di nav kurd û tirkan de zûka kifş bibin...

Da ku rihê nifşên nû li ser çand û zimanê xwe şîn bibe...

Da ku zimanê kurdî bibe alaya siyaseta kurd û Kurdistanê...

Da ku cîranên(tirk/ereb/faris) me hebûna me zûka bipejirînin...

Da ku êdî kurd wekî turîstan li ziman û çanda xwe nenêrin û pê serbilind bin.

***

Êrê, êdî dora boykotkirina zimanê tirkî ye! Da ku siyaseta kurd di dawa zimanê kurdî de ji nû ve were ser rûyê dinyayê…Da ku rewşenbîrên kurd danûstandina bi zimanê kurdî re di rih û hişê xwe de wekî tiştekî normal bihesibînin û pê bijîn…

Da ku zarokên vî welatî bi şexsiyet û karektereke xurt ve ji civaka me re bibin neynik. (Gelo pêwîst e ku meriv behsa têkiliya ziman û şexsiyeta insên bike?)

Da ku ken û girînên me di civat û şevbêrkên vî welatî de bi têra dilê xwe bistewin. (Gelo pêwîst e ku meriv behs bike ku ev demek dirêj ev civak bi zimanê xwe nagirî û nakene?)

***

Belê êdî dora boykotkirina zimanê tirkî ye!Yên ku vê banga min bi dil û çavekî şaş bixwînin, ez dîsa tînim bîra wan:

Kurdên ku bi ziman û çanda xwe mezin bibin, dê bêtir bikaribin hez ji çand û zimanê cîranên(tirk/ereb/faris) xwe jî bikin.

Kurdên ku bi rih û hebûna xwe bi riya zimanê xwe xurt û têkûz ava bikin, wê bêtir bikaribin rih û hebûna cîranên(tirk/ereb/faris) xwe jî fêm bikin.

Kurdên ku bi stran û tilîliyên xwe ve bicoşin, wê bêtir bikaribin xwe berdin nav avcoya stran û tilîliyên cîranan jî.

---

## Qerf Henek

### Ziman ziyaret e




### Mal dibistan e dê jî mamoste ne




www.arsivakurd.org

Rupel 12++++++:Layout 1  22.09.2010  15:06  Page 1


# Rojeva Welat

23 Îlon 2010 Hejmar: 16 Sal:1 www.welat.com

ROJEVA WELAT
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Sevim KAPLAN

Yönetim Yerî: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No:9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88

Yayın (Weşan) TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP): Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.


# Bi qebîliyeta xwe alîkarî dide malbata xwe




Keça ciwan a bi navê Zozan Çagli (19) dukaneke vekir û berhemên xwe bi xwe nexş didê. Çagli ligel hemû astengiyan bi tena serê xwe dukanê dixebitîne û debara malbata xwe jî dike




**ŞIRNEX / DÎHA** - Zozan Çagli ya 19 salî li Cizîrê dikana berhemên destan a ji bo diyariyan vekir û qebiliyeta xwe di vê dikanê de pêş xist. Çagli hêj di temenê ciwan de bû xwedî pîşeyê. Berhemên Çagliyê li navçeyê eleqeyeke mezin dît.

Li herêmê bandora cinsiyeta civakê bi rêbazên cuda cuda xwe dide der û ji ber wê jî jin dema tevli qada jiyanê dibe pirsgirêkan dijî. Ligel wê jî jin li dijî cinsiyeta civakê têdikoşe. Li herêmê cîrokên jinên serkeftî gelek zêde dibin û jin tabuyên ku bi salan heyî bi hewldanên xwe ji holê radikin. Gelek jin bi qebiliyeta destan xwe nîşan dide. Yek jî van jinan jina ciwan a 19 salî Zozan Çagli ye. Çagli bi motîfên dîrokî kelepelên diyariyê dixemilîne û rengek cuda dide diyariyan. Çagli, bi wê xebata xwe cara yekem li Cizîrê dikana diyariyan vekir.

Çagli, bi boyax, tutkal, sîm, sîlîkon, aluminyum folyo û çeka sîlîkonê, keştî, tablo, vazo, sindok, neynûk û panoyan çêdike. Her wiha kelepelên berê jî carek din dizayn dike. Tiştên ku Çagli çêdike rastî eleqeyeke mezin tê. Çagli, hêj di biçûktiya xwe de eleqeyê nîşanê wê pîşeyê da û piştî ku pêş ket bi wê pîşeyê alîkarî da debara malbata xwe. Cara yekem dikaneke bi wî rengî li Cizîrê hate vekirin. Çagli têkiliya xwe ya di navbera kiryaran de her çû mezin kir û di nav van de xwe da hezkirin.

Çagli, destnîşan kir ku gelek kiryar tên û sparîşan didin û wiha got: "Bi saya kiryaran jî ez xwe pêş dixim. Ez bi wî karî hem xwe nû dikim, tiştên nû him dibim û alîkariyê aborî didim malbata xwe. Bi taybetî ez motîfên dîrokê yên Cizîrî re mijûl dibim." Zozan Çagli, di axaftina xwe de bal kişand ser ser kar û barê xwe û got ku divê jin di her qadê cih bigire. Çagli, got ku serxwebûna aboriyê ji bo jinê gelek girîng e. Çagli, destnîşan kir ku heke aboriya serbixwe hebe dê baweriya jinê jî xurt bibe. Ji bo Çagli hem jinbûn û hem jî xebat gelek zehmet e. Çagli, daxuyand ku ligel hemû zehmetiyan dê têkoşîna xwe bidomîne.

## Ji Şaredariya Sixkê xebateke mînak

**WAN-** Li bajaroka Sixkê ya Wane boriyên avê yên ku kevn tên nûkirin. Ekîba ku girêdayê şaredariya Sixkê ye boriyên avê yên ku kevn bibûn û welatî mexdur dikirin ji nû ve çêdike.

Li bajaroka Sixkê ya Wanê xetên avê yên kevn tên nûkirin. Di çarçoveya xebatan de ji ber cadeya Huriyetê heta ber cadeya Barişê xebatên xetên avê hatin dest pêkirin. Li hêrêmê ji ber ku xet kevn bûn her tim pirsgirêk derdiketin û şaredariyê bi armaca ku mexdûriyeta gel ji holê rabikin û xizmeteke baştir bikin dest bi xebatan kirin. Ekîba Şaredariya Sixkê boriyên nû dike. Li taxa Gundogdu bi giştî 650 metre borî dê bên nûkirin. Her wiha dê xetên aboneyê jî bên nûkirin.

Şaredara Sixkê Nezahat Erguneş der barê xebatên xwe de axivî û diyar kir ku li vê taxê dem bi dem pirsgirêkên bi vî rengî derdikevin û ji ber vê dest bi xebatan kirine. Erguneş da zanîn ku dê di demeke kin de xebatên wan bi dawî bibin. Erguneş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di encama lêkolînê de me xetên boriyê avê yên kevn tespîtkirin. Em weki şaredariyê xebitîn û me xet nûkirin. Ji bo me tenduristiya gelê me gelek girînge. Em niha hemû xetên avê yên bajarokê kontrol dikin. Em dê hemû xetên kevn nû bikin."




## Ji Serdema Navîn heta îro mucewhereke ermeniyan

**STENBOL** - Girava Axtamarayê ya di nava Gola Wanê de û xwedî avahîsazî û hunereke serkeftî ya ermeniyan a Serdema Navîn e. Her wiha ji bo hemû xiristiyan jî mirateyeke dîrokî ye. Ji aliyê weşanên Londra û Stenbolê bi navê pirtûka "Axtamara: Mucewhera Avahîsaziya Ermeniyan a Serdema Navîn" hate nivîsandin.

Piştî 95 sal rojên borî li Dêra Ermeniyan a Surp Hac (Xeca Pîroz) a di nava Gola Wanê de cara yekemîn ayîn hate lidarxistin. Ji bo ku wateya Axtamarayê baş bê zanîn li ser dêrê pirtûkek hate weşandin. Lijeneya Stenbolê ji bo xwedî li mîrateya çandî derkevin hatin cem hev. Enstîtuya Gomîdasê ya navenda wê li Londrayê ye xebatek bi navê "Axtamara: Mucewhera Avahîsaziya Ermeniyan a Serdema Navîn / Aghtamar: A Jewel of Medieval Armenian Architecture" pirtûka bi tirkî û ermenkî hate amadekirin.

Di pirtûka ji aliyê Ara Sarafian û Osman Koker ve bir tîrkî û îngîlîzî hate komkirin û ji 168 rûpelan pêk tê, di nava pirtûkê de 68 rûpel bi wêne û ji avahisaziya dêrê pêk tê û her wiha 19 rûpel jî ji nexşe û xêzan pêk tê.




# Ji bo jinên koçber atolye vedikin

**ÊLIH / DÎHA** - Cîgira Şaredarê Êlihê Gulîstan Akel, Navenda Hilberîna Jinan ku dê di 15'ê cotmehê de bê vekirin, ziyaret kir û amadekariyên dawî kontrol kir. Akel, diyar kir ku ev proje jinên ku li dora taxên bajêr dijîn û mexdûrê koçberiyê ne hedef digire, dê jinan tevli pêvajoya hilberîniya aktîf bike. Akel, da zanîn ku dê ev navend dê bibe bingeha kooperatîfbûyîna jinan.

Amadekariyên Navenda Hilberînerîyê ya Jinan ku li tenişta Mala Gel a Mehmet Sîncar ku li taxa Petrolkentê ye, ji bo bigihîje Festîvala Çand û Hunerê ya Heskîfê ya Êlihê ya 15'ê cotmehê bê kirin, hate asta dawî. Cîgira Şaredarê Êlihê Gulîstan Akel, bi Hevseroka Rêxistina BDP'ê ya Êlihê Saadet Becerîklî, endamên meclisa jinan a şaredariyê re li navendê dest bi lêkolînê kirin. Akel diyar kir ku projeya navenda jinan, ji bo jinên mexdûrê koçberiyê ê malbatên wan xizan in û ji bo jin bi awayekî aktîf beşdarî pêvajoya afirandinê bibin hatiye çêkirin. Akel wiha got, "Me bi vê projeyê xwest ku çawa mêr ji hemû qadên bajêr sûdê werdigrin jin jî bi wî awayî jê sûdê wergirin."

**'Hedef maxdûr in'**

Akel diyar kir ku jinên Êlihê di jiyana civakî û aborî de pirsgirêkan dijîn ji bo van pirsgirêk û astengiyan çareser bikin jî xebatên cur bi cur dimeşînin û wiha domand: "Asta têkiliya jinan a bi dazgehên civakî re pir qels e. Em dixwazin ku çawa mêr ji her qadê jiyanê sûdê werdigire jin jî herî kêm weke mêran bi meqanîzmayên rast jê sûde wergire."

Di vê xebatê de bi taybetî tiştê sereke ew e ku têkiliya jinê bi qadên aborî re bê çêkirin. Me bi vê armancê hewcedariya jinê dît û me xwest ku dest bi vekirina navendên jinan ên perwerdehî û afirandinê bikin."

**'Gavek girîng e'**

Akel destnîşan kir ku ev xebat û proje ji bo vekirina kooperetîfên jinan gaveke girîng e. Ekel da zanîn ku ev pêvajoya belkî hinek zahmet be lê ew ê weke jinan bi serkeftî ji vê pêvajoyê derkevin û wiha got:

"Di navenda vê projeyê de dê dezgahên çêkirina merşan, qursên karên destan bên dayîn û bi vî şiklî dê jin di hêla aboriyê de têra xwe bikin û hewcehiya wan bi kesî namîne."



## Şaredariya BDP'ê xebatên xwe bê navber dimeşîne

**MÛŞ**- Şaredariya Melezgîra Mûşê, niha li navçeyê xebatên du parkên nû, binesazî û rê dimeşîne.

Ji aliyê Şaredariya Melezgîrê ve xebatên ku hatibûn destpêkirin bi 6 xalan didome. Li navçeyê niha xebatên rê, binesazî û parkan didome û her wiha cadeyên ku li navçeyê hatine çêkirin jî hemû temam bûne. Şaredarê Melezgîrê Nurî Balci der barê xebatan de nêrînên xwe anî ziman û destnîşan kir ku xebatên ku hewl didan îsal temam bikin yek bi yek pêk anîne û got ku ew ji ber vê yekê kêfxweşin.

**'Me kes mexdûr nekir'**

Balci anî ziman ku di dema xebatên rê de 40 hezar metrekare kevirên parke raxistine û ligel esasa gel, hilweşandinên xaniya pêk anîne û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Me bi hezaran xanî hilweşandin û me tu kes mexdûr nekir. Pirsgirêka herî mezin rê, binesazî û av bû. Li taxên Selçuklu, Saltuk, Gazî û Saytekîn xebat hatin meşandin. Me riyên nû çêkirin û ji bo îmarê vekirin. Bi vî awayî kêm be jî me di warê vegunestinê de pirsgirêk ji holê rakirin."

**Li Melezgîrê du parkên nû**

Balci da zanîn ku li Melezgîrê li du taxan du parkên nû hatine çêkirin û her du park bi piştgiriya Yekitiya Şaredariyên GAP'ê hatin çêkirin. Balci axaftina xwe wiha berdewam kir: "Xebatên me niha bê navber dimeşin. Em vê projeya xwe dê temam bikin. Em li gorî pêwîstî û hewcedariyên gel dixebitin. Di demeke din em dê parqên xwe temam bikin."

Welatiyê bi navê Halîs Aliç ku li taxa Selçuklu rudine diyar kir ku ew ji van xebatan gelek kêfxweşin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ev der hemû doz û ax bû. Me ji şaredariyê daxwaz kir ku rê bên çêkirin. Me erseyên xwe dan şaredariyê. Em ji doz û dumanê xilas bûn."

Welatiyê bi navê Alîcan Dalyan jî wiha got: "Şaredariyê ji bo taxan xebatên gelek girîng kirin. Em spasiyên xwe pêşkêşî şaredariyê dikin."



www.arsivakurdi.org